

# wejlat!

Sal:1 Hejmar:22 19-25 Tîrmeh 1992 3000TL(KDVD) Rojnameya hefteyî

## Sefera Navenda Çanda Mezopotamya

- Çalakiyên Navenda  
Çanda Mezopotamya  
yê, bi şahiya piştgiriya  
Navendê li rexê Behra  
Sipî, gavek dinê hate  
avêtin. NÇM ê berî vê  
çalakiyê jî, li bajarê İstenbolê  
şahiyek çekiribû. Di van çalakiyân  
de armancê Navendê anîne zimên.

Râpel 15

## Biratîya Kurd û Tirkan Felat Dilges

Râpel 5

## İdianame xerîta Kurdistanê nîşan dide Mustafa Demir

Râpel 6

## Dergûşa mirovahiya Botan R. Cizre

Râpel 6

## Eşqa Kurdistanê li Mezlûm ketibû Kebîre Doğan

Râpel 7

## Hikûmeta Amerîka li Başûrê Kurdistanê Şoreş Dîcle

Râpel 3

## Kuştina Çawçisko çare bû? Dilbixwîn

Râpel 4

## Peymana Lozanê û qedera gelê Kurd M. Ali Tüysüz

Râpel 10

## William Shakespeare: 'Cihan tev de sahneyek e' Çilkezî Keskin

Râpel 11

## Pertew Begê Hekari Behzat Berçelanî

Râpel 13

## Piştî 49 salan 33 gulle Günay Aslan

Râpel 16

## Di çanda me ya kevin de sixef, filîtentî û leqebr Medenî Ayhan

Râpel 12

Nivîskarêñ Kurd Jan Dost:

## Nameyeke vekirî ji nivîskarêñ Tirk re

Ez nivîskarekî Kurd im, dixwazim çend gotinan ji we re bêjim, hêvîdar im hûn guhê xwe bidin min.

Hûn jî zanîn, ez jî zanîm, ku mirovîn nivîskar, ci rojnamevan, ci torevan, ji herkesî bêtir ji rewşa dora xwe agahdar dibin, ez nîzanim hûn çîma bi çavekî tenê dinêrin, bi guhekî tenê dibihîzin?

Ji Nazim Hikmet bigrin, heta Aziz Nesin yekî tenê pîrsa kurdî ne anî ser zimanê xwe.

Râpel 15



# Dewlet dijminê herkesî ye

*Dewlet zilma xwe ne tenê li ser Kurdan, li ser gelê Tirk jî bi kar tîne.*



Li aliyeke Kurd bi têkoşîneke mafdar de, bi bîr û bawerî û bi rêxistin, di meşeke dûr û dirêj de ne, li aliyê din, memûr, karker û xebatkarêñ Tirk, li dû mafêñ xwe yên çarenûsi, yên aborî, civakî û siyasi, di destpêka meşeke nû de ne. Ev meşen herdu gelan, dê li ser bingeha wekhevî û bîratîyê berbihev biçe û bi yek dengekî vê rejîma hov û faşîst hilweşîne.

Râpel 15

## Ev şerekî îlankirî ye

- Bûyerên çend rojan bi tenê jî, dijwariya şer û xurtiya gerîla derdixe holê. Dewlet bi temamê hêzên xwe, nikare li hember gerîla xwe bigire. Îdî balafir û helikopterên wan jî bi kîri tiştekî nayîn, yeko yeko dibin he-defê çekêن gerîla û hildiweşin xwarê.

Îdî ev şer, şerekî ne îlankirî nîne, lewra ev şer bûye şerekî giştî ku li çarmedorêñ Kurdistanê dom dike û îdî nayî veşartin. Gerîla hêzên xwe xurt kiriye û îdî bi hejmarek zêde gerîla di êrîşan de cihê xwe digirin. Dewlet jî, bi temamê derfet û hêzên xwe, di şer de ye. Lî baş xuyaye ku, gerîla her diçe bi hêztir û çalak dibe. Ber bi ordîbûnê ve dimeş, têkiliyê wan û gel, her diçe xurttir û germtir dibe. Ji xwe îdî li Kurdistanê her kesek bi serê xwe gerîlayek e. Dewlet

xwe nikare ji vî şerî xelaske, lewra dîroka Viyetnamê xwe li Kurdistanê nû ve dike.

Ev bûyerên jêrîn yên hefteyekî ne, gelek kêmasyiyê wî jî hene, lewra gelek tişt têne veşartin. Lî em bawer in, wê ev nûcê germbûn û dijwariya şerî li Kurdistanê şanî bidin.

10.7.1992 -Cerdevan çekêن xwe datînin. Li Sasonê 6 cerdevan istîfa kirin.

-Li zozanê Gelemîz (Wan) şerê ku 5 roj berê, di navbera gerîla û leşkeran de destpêkiribû

Râpel 15

Kovara "Ak-zuhur" Hîzb-î kontra çawa dibîne?

## Dewletê wezîfa ülküçüyên berê, daye Hîzb-î kontra

- Dewletê, wezîfa ülküçüyên berê, li Kurdistanê daye Hîzb-î kontra. Kontra ji bo ci mirovîn welatparêz dikuje, wê bi vî awayî bigîhe kuderê? Yênu ku heta niha ji vê dewleta zâlim dilopek xwîn nerjandin ji bo ci armancê Kurdan dikuji. Hêza wan ci ye û karin ci safî bikin?

Râpel 15

## ROJEVA WELÊT

### Cihê ku lê edalet tune be

D i xwezayê (tebîetê) de însan serdestê hemû jîndaran e. Mirov bi raman û hişê xwe ji jîndarêñ din diveqete. Bes hebûna hiş û ramanê jî ne bes e ji bo gihaneka mirovbûyînê. Ji bo qonaxa însanetiye pêdivî bi hinek nirx û hêjahiyeñ din heye. Pîvana bingehîn û mirovbûyînê edalet e. Hebûna edaletê pîvaneke ku mirov pê hildikşê ber bi mirovahîye ve. Gotineke filozofî romayî Cicero heye, dibêje: "Cihê ku lê edalet tune be, bêrûmetî li ser kar e."

Râpel 15

## REWS

Abdullah Keskin



## Kultur û politîka

"Tu deverê din wek li Kurdistanê edebiyat û politîka bi hev re hatine girêdan tune ye."

Ev hevok (cumle) min ji kitêba Mehmed Uzun ya nû (Destpêka Edebiyata Kurdi-Weşanxana Beybûn) girt.

Gelekî rast e, lê ne tenê edebiyat, bi baweriya min hemû cureyên kultura kurdi bi politikayê ve girêdayî ne. Ev girêdan heta ku qedexe û astengên li ser kultura kurdi rabin wê dom bike. Rewşa giran a xirab, ya Kurdistanê ye. Pêşketin û azadbûna kultura me bi qederâ welatê me ve girêdayî ye. Şerê hebûnê, şerê jiyanê ji xwe kulturê jî bi pêş dixe.

Edebiyata hemdem di welatekî pêşketî de, di civakeke azad de mimkun e. Li dîrokê binêrin; çima di dema Hitler de li Almanya edebiyat û hemû besen hunerî mirî ne, ji bo ci li Italyaya Musolinî huner tune ye? Mirovê wan civakan ne azad bûn. Di civakeke bindest û zordar de cihê huner û edebiyatê tune ye. Sebeba girîng ev e.

Hinek mirov carna dibêjin "Welat geleki politik e." Rast e, Welat politik e û wê politik ji bimîne. Her tişt li alîkî derketina rojnameyek xwerû bi kurdi, bi xwe politik e. Fonksiyona kulturi ji geleki girîng e û em vê fonksiyona Welat îhmal nakin. Di aliye kulturê de valahîyeke pîr mezin heye. Ne valahiya 70 salî ya 700 salî zû bi zû bi 16 rûpelan nayê dagirtin.

*Edebiyata hemdem di welatekî pêşketî de, di civakeke azad de mimkun e. Li dîrokê binêrin; çima di dema Hitler de li Almanya edebiyat û hemû besen hunerî mirî ne, ji bo ci li Italyaya Musolinî huner tune ye? Mirovê wan civakan ne azad bûn. Di civakeke bindest û zordar de cihê huner û edebiyatê tune ye. Sebeba girîng ev e.*

Mehmed Uzun di eyî kitêba xwe de dibêje: "Ronakbîren welatekî, rûmetâ wî weletî ne." Ronakbîr ji kî re tê gotin, mirov çawa dibe ronakbîr, şertîn ronakbîrtiyê ci ne û ji bo rûmetiya welatekî ci pêwist e? Bersiva van pirsan, naveroka vê gotinê dadigire.

Divê mirov axa ku li ser dijî û pirsgirêkên welat û kultura xwe baş binase. Iro bajar û

gundêne me, bi cinazên însanên me têne raxistin. Weke kampê Hitler bi hezaran însan kom dikan. Emê çawa ji vê zulmê re çav û guhê xwe bigirin? Li dijî vê wehşetê bêdengî tê ci manê?

Rojnameyeke Kurdi kare bêdeng bimîne? Gelek biwîj u gotin, li gorî demê mana wan tê guhertin. Iro ji "girêdan" ji bo me tê manekê, ji bo nivîskarekî Alman an ji Fransî tê maneke din. Ev di civakeke azad (li gorî a me) de dijîn, muxalif in. Emê li welatê xwe yê bindest muxalifê kê bin?

Em muxalefeta gundiyyê Kurd ku bi hezaran di kampan de kom dikan nakin, em muxalefeta şervanê azadiyê nakin. Heçî dikan û bikin ji ne muxalefetê; belê şîrîkatî û hevalbendiya dewletê dagîrker dikan.

Bi girêdanê ve azadiyekê mezin heye. Kîjan nivîskar û rewşenbirêne me ji Jean-paul Sartre, an ji ji Luis Aragon û Paul Eluard azadtir û serbixwetir in? Aragon û Picasso ji, ji rewşa welatê xwe ne dûr bûn û bîtêkoşina gelê xwe ve girêdayî bûn.

Ji bo em ji hemû bend û girêdana xelas bibin divê welatê me rizgar bibe. Kultureke demokrat, huner û edebiyateke hemdem di welatekî azad de mimkun e, ji bo însanê me serbest bifikirin û li kultur û zimanê xwe vegeerin, berî her tiştî divê zilma zordarî ya li ser ji-yana wan rabe.

## FERHENGOK

Bandor: Tesîr, hîkarî

Berbang: Şeveq (şafak)

Çek: Silah

Darz: (yargı)

Demajo: Pêvajo (süreç)

Dilgerm: Bi heyecan

Dilgermî: Heyecan

Dilges: Bi keyf

Dilgesi: (sevinç)

Dilşewat: keder

Dilşewiti: Bi keder

Jindar: Bi can (canlı)

Nijad: (irk, soy)

Nijadperest: (irkçi)

Notirvan: (nöbetçi)

Rexne: (eleştiri)

Rexnegir: (eleştirmen)

Salveger: Sazivir (yıldönümlü)

Serdema Navîn: (Orta Çağ)

Şano: (sahne, tiyatro)

Temâsevan: (Seyirci)

Vekolin: Lêkolîn (İnceleme)

Xwesipartin: Teslîmiyet

Bijarte: Elît (seçkin)

Hilbijartî: Bijartî (Seçilmiş, ayıklanmış)

Dîrokñas: Dîrokvan (tarihçi)

Erdnîgar: Cografya

Dadgeha Ewlekarî ya

Dewletê: Devlet güvenlik mahkemesi

## Dergûşa vala

Berî demekê, rojnameyên wek "Sabah" û "Milliyet" û Televizyona "Inter-star", li ser bûyerêni wiha dêşe, û bi dayikên weke daika "Burcu" dişewite, û bêguman, her kes dixwaze ew ji-na Elmanî "Monica Getmonder" ya ku "Burcu" revandibû, bê girin û ceza bibe.

Lê divê em pirsekê ji rojnameyên weke "Sabah" bikin, gelo heta niha çend dergûş li Kurdistanê vala mane? Çen dayik çav

Bi rastî dilê mirov bi bûyerêni wiha dêşe, û bi dayikên weke daika "Burcu" dişewite, û bêguman, her kes dixwaze ew ji-na Elmanî "Monica Getmonder" ya ku "Burcu" revandibû, bê girin û ceza bibe.

Hûn li ser me û têkoşina me

çawa dînîvisin, bînîvisin, xort û keçen me yên qehreman, iro li ser zinarêni çiya rastiyê bîxwînî dînîvisin, em wan nîvîsandinan, weke Ayetîn Quranê dixwînin.

J. D.

## Ji kampa Mêrdînê

## Nakevin

Nakevin em namirin  
Gelê merdên qehreman  
Şer in ku em radibin  
Azad dikan niştiman

Kêla dijmin warê me  
Derd û jarî barê me  
Merge gorî karê me  
Pêşmerge ne pîr û can

Ey dijminêt cora û cor  
Çendî bikin zilm û zor  
Warî bisojin jêr û jor  
Qet namirit Kurdistan

Çend çol biken gund û şar  
Ser binîn pîrî zêmar  
Bizên xwîn kanî û rûbar  
Dê her mînît welat man

Kurdistana bi dest û şax  
Çend lê bîborin dem û çax  
Qet namirît tax û tax  
Bîşkoja baxê Cîhan

## Bazgor

Ez xwendevanekekî welat im  
Bi salan mejiyê me, mabû weke  
axeke ziwa, ci a didîta dimêt.  
Weke her xemgînê xwendinê,  
hewceyî akek zelal bû. Iro va  
avek zelal, ji qontara çiya dixul-  
xule û tê, deşt û bajar û gundan  
dadigire. Li çiya dengê gullan  
bûye banga azadiyê, pênuşa nî-  
vîsarên Welat, ji tîbûn û zi-  
wabûna mejiyê me dibe, û rewşa  
welatê me tîne holê. "Ez nîza-  
nim bi kurdi bîxwînim, hinek  
peyv hene ez wateya wan nîza-  
nim." Ev gotinê kevn nema di-  
meşin. Eêdî xwe xefkirin, bê

feyde ye. Dem û dewra minafî-  
qiyyê ya durûtiyê, nanê İsa bixwe  
paletiya Mûsa bike derbas bûye.

Qehreman û seydayê honrawê  
(şir) gor pîroz Cegerxwîn  
dibêje: (Kes bi dîlok û bi lav lav,  
vê berê nabe serf) divê em çape-  
meniyê naskin, dost û xwefiro-  
şan baş binasin.

Birano, xwendevanno çape-  
meniya bi aring (boyali) nexwî-  
nin, serê xwe bi virr û durûtiyâ  
nîvîskarên zik tenî neêşin. Za-  
nibe li welat gulla di bedena te  
de (eğer xwe nasbî) derbas dibe  
ci ye ew pênuş jî ew e. Bes şe-  
kirên jehrikîn bîxwin.

Digel silavên hevaltiyê  
Bêkon Pojan

## Em we ji bîr nakin

Wan bi berxwedanên xwe "Bastî" a  
Kurdistanê, zîndana Amedê, kevir bi  
kevir, hilwesandin û di singa dewle-  
ta faşist de xençera mirinê ya PKK'ê  
çikandin. M. Hayri Durmuş, Ke-  
mal Pir, Akif Yılmaz, Ali Çiçek, di  
grevîn bîrcibûnê de bedenê xwe ji  
bo jiyanê azad û serbixwe niqtun-  
tanê bûn kaniya jiyanê.

Ew bi berxwedanên xwe yên li  
zîndanan, ji xelkê me û rîberê wê  
PKK'ê re, rî û mecalâ destpêkirina  
têkoşina neteweyî vekirin û bi van  
livbaziyên xwe, bûn sembla  
têkoşina demokrasî û serxwebûnê.  
Ew tovî ku bi destê van lehengan li  
ser xaka Kurdistanê hat reşandin;  
berhemên xwe da û ji gelê me re de-  
riyê jiyanê nû û bi rûmet vekir. Li  
ser bîngehêne vê jiyanê serhîdan li  
dar ketin û ev serhîdan, bi şehîden  
wek Wedat Aydin re xeletek din bi  
dîroka berxwedanên Kurdistanê ve  
vekir.

Em li ber şehadeta Hayri, Kemal,  
Akif, Ali û Wedat ku bi berxwedan-  
en xwe rîça serfirazî û serx-  
webûnî li ber gel û partiya xwe ve-  
kirin, serî pêl didin û şehadeta wan  
pîroz dikan.

"Şehît her dem rûmet û hêza me  
ne"

M. Çelik- M. Isa- M. Savaş- S.  
Alkan- M. Adıyaman- İ. Güll- A.  
Sönmez- C. Tok- E. Akyıldız- A.  
Varlı- M. Demir- M.M. Karataş- C.  
Rızaogulları- A. Ünal- M. Yıldız- R.  
Çiğdem- F. Aran- E. Aydin- İ. Arslan-  
Y. Erdoğan- H. Şahin- H. Çınar-  
T. Demir- E. Özbay- E. Talip-  
C. Kahraman- H. Teomete- A.  
Alkan- M. Sinci- İ. Cakmak- B.  
Narin- A. Avcı- M. Muhammet- H.  
Yıldırım- A. Çakmak- A. Çelik- R.  
İşik- İ. Gültekin- Y. Özbay- A. Yağ-  
ci- M. Güney- H. Çelik- K. Çelik-  
A.I. Kitay- İ. Güvercin- M. Bektaş-  
N. İğac- A-Eroğlu- M. Uğur- S. Polat-  
N. Özkurt- M. E. Akkuş- A. Gürmezoğlu-  
M. Ülgenc- B. Çelik- M. Taşdemir- G.  
Demir- M. Eray- K. Güneş- F. Abi- A.  
Elmas- Y. Temel- H. Boran- F. Kartal- M.  
Bakış- M. Marangoz- A. Akkuş- M. Birhimeoğlu-  
S. Tokmak- A. Aliç- E. Karataş- B. Yılmaz.

Ji zîndana Nevşehir  
dîliyên PKK'ê

## KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin  
aboneyê Rojnameya WELAT

Nav :

Paşnav :

Navnîşan :

Bedelê abonetiyê razînîn:

Li Tîrkiyê : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu  
Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu  
Şub. Döviz tevdîat hesap No: 3113617

Aboneyen héja,

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê  
razandina bedelê abonetiyê bişînîn. Navnîşana  
WELAT Nuruosmaniye Cad. Atay Apt.

No:5 Kat:1 D.4

Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 511 57 60-511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercen abonetiyê:

Li hundir

6 meh

12 meh

Li derive

30 DM

60 DM

Kontr-gerîla, Faysal Kızılırmak ji paş ve kuşt:

# 'Ku ez mirim, li pey min megiri; lê bilîne'

Belê dijmin welatparêzek din jî qir kir, lê bi vê qirkirinê gelê ku ev 12 sal in, di nava bêdengiyê de bû, awazên xwe vekir û bi dengekî bilind xwesteka xwe ya di dilê xwe de anî ser ziman û serî hilda. Carek din derket ber çavan ku gelê me êdî bi terora dijmin û qirkirinê şerê taybeti natemire û tirsonek nabe

## Servan-Ceylanpınar

Piştî bêdengiya 12 salan Dewletê dest avêt Serêkaniyê jî... Piştî cuntaya faşist a 12'ê Îlonê, ev cara yekemîn e ku Kontr-gerîla li bajarê Serêkaniyê (Ceylanpınar) dest bi kuştina welatparêzan dike. Faysal Kızılırmak (33) bi destê kontr-gerîla bi xiyanetî (-ji paş ve-) hate kuştin...

Bajarê Serêkaniyê li ser tixûbê Kurdistanâ Başûrê Biçük û Kurdistanâ Bakur e (Di navbera Tirkîyê û Suriyê de, li aliyê bakur e). Serêkaniyê bi xêr û bêra çiflikâ ku dewletê li wir ava kiriye tê naskirin, ji ber ku di dinê de çiflikâ duymen e. Gelê Serêkaniyê nanoziko li vê çiflikê kar dikin û dewlet bi keda wan pîr dewlendend dibe.

Berya 12'ê Îlonê, şoreşge- ran gelek kar û xebat li Serêkaniyê kir û gelê wir bi welatparêziya xwe nav da. Bi rîberiya şoreşgerên Kurdishanê şiklê Demokrasiya gelf wek Hilwan, Batman û gelek derdorê din li Serêkaniyê jî ava bû û gel, Belediye xist destê xwe. Di hilbijartînê Belediyê de adayê xwe hilbijart û belediye xist bin xizme- ta gel. Bi alîkariya Şoreşgerên Kurdistanê Belediya Serêkaniyê wek Komun'ê kar kir û gel gelekî bi vê hisyar û kîfxwes bû û cara yekemîn bû ku ji bin diktatoriya dewletê derdiket û jiyanekî demokra- tîk nas dikir.

Dema ku di sala 1980 an de cunta ya faşist bi zordesî bû serdar, li wê derdorê pêşî bi ser gelê Serêkaniyê de meşîya û bi sedan welatparêz girtin, her sîkak tije leşker kirin û terorek bê hed û hesap li ser gel meşandin. Dewletê wiha işkence û zordarî meşand ku kes nikaribe serê xwe rake...

Ji ber ku xaka Serêkaniyê deş bû, ev çend sal in gerîla li wir bi xurtayî nikaribû kar bikira. Berya niha bi du salan du gerîlayê bajêr li wir demekî kar kirin; Bişar Akbaş û İsmail Gul, ji zîndana Amedê derketibûn û dixwestin ku gelê Serêkaniyê ji nû ve hisyar bikin û agirê têkoşinê li wir jî gurr bikin...

Di sala 1990 an de di

navbera van her du gerîlayê hêja û hêzên dewletê de şer derket û her du gerîla heta fişengên xwe yê dawî li hember dijmin ser kirin û bi serbilindayî gîhiştin mertebe- ya şehadetê.

Bi vê şehîdbûnê gel hebekî bi ser xwe ve hat. Lê dijmin gelek leşker û polîsîn xwe xistin wir û bi ser gel de terorek dijwar domand û karê istixbaratê pêş ve bir, ku kes serê xwe raneke. Dîsa jî di Newroza îsal de, gel çepera tîrsî şîkand û piştî bêdengiya 12 salan cara yekemîn Newroz bi tevayî pîroz kir û li hember dijmin ser hilda.

Piştî serhildana Newrozê dijmin ji nû ve êrişa şerê taybeti, bi şiklek psîkolojîk bir ser gel. Gelek kesen xerîb ji derve anîn û bi tilama çiflikê xistin nava gel. Ev kesen xerîb bi pirrayî ji rexê Tirkîyê hatibûn û tev barûte bûn. Ew bingehê kontr-gerîla bûn. Dewletê dixwest ku berî hisyarbûna gel, bi kuştin û girtinan çavê gel bitîrsîne û wan tirsonekî bike. Ji ber vê yekê roja 9'ê Tîrmehê saet 07 û nîvê sibehê dema ku karker diçûn ser kar, endamê kontr-gerîla kemîn vedan û welatparêz Faysal Kızılırmak bi xiyanetî jî paş ve kuştin.

Piştî 12 salen bêdengiyê dijmin bi vê kuştinê dixwest ku gel bitemirîne, lê wek ku tiliya xwe têxe kunemozê, gel hîn bêtir li xwe xwedî derket û bi ser dijmin ve der bû.

Bi sedan jin, zarok, zilam û xorbi serhildanek pîr hêja cenazeyê şehîd Faysal li ser milê xwe kirin û bi dirûşmeyen "Şehîd namirin", "Bimre Hîzb-î kontra", "Kurdistan Faşizme mezâ olacak", "Dewlet terörüne son", "Bijî Serok Apo" û bi lîlandin û çepikan meşîyan ser mezel û li wir bi rawestina şehîdan cenaze teslîmî xaka welat kirin û dîsa bi dirûşme û lîlandan meşîyan heta nava bajêr û belav bûn. Dijmin çiqasî derdora gel bi leşker û qirkirinê şerê taybeti natemire û tirsonek nabe; hîn bêtir hisyar dibe û li doza xwe û li şehîden xwe û li welatiyê xwe û li masfîn xwe xwedî derdikeve û ev jî nîşana nîzîkbûna serxwebûna gelê me ye.

Bi vê qirkirina dijmin ku li Serêkaniyê jî destpêkir, carek din eşkere bû ku gelê me doza

xwe nas kiriye û ji qirkirinan natirse, lê hîn bêtir hisyar dibe û li hember dijmin dibe yek û serî hilde.

## FAYSAL KIZILIRMAK KÎ BÛ?

Welatparêz Faysal ji bajarê Mérînê, bavê 5 zarokan bû. Ji ber feqîrî û zîlma dijmin ji gundê xwe derketibû û hatibû bajarê Serêkaniyê ku li çiftlikê kar bike û malbata xwe xwedî bike.

Her ku şerê rizgariya neteweyî pêşve diçû, Faysal hisyar dibû û dilê wî ji bo şerê welatê wî lê dixist. Lê ji ber ku dijmin terorek şerê taybeti bi ser gel de dimeşand ev hisyarbûn û dilê xwe de û di mala xwe de dihişt. Bes piştî ku pêjna gerîla li Serêkaniyê kir wek ava ku di tehtê re ji nişka ve der bibe, germiya dilê xwe anî ser ziman û di nava her civatan de li ser têkoşînê axavtin kir û xwest ku gel ber bi têkoşînê ve bikşine.

Dijmin, ev rewşa Faysal dît û jê aciz bû. Ji ber ku bi dengkirina Faysal gelek kes nîzîkî têkoşînê dibûn. Ji ber vê yekê dijmin kuştina wî xist planê xwe ku bi vê kuştinê mesajek wiha terorî bide gel ku kî li ser têkoşînê baxive wê bê kuştin û gîring e herkes bibe koleyê dewletê.

Faysal jî fêhm kiribû ku dewlet dixwaze wî bikuje. Ji pîreka xwe re got: "Ew kesen ku bi destê dewletê hatine vir taqîba min dikin. Ku rojekê min bikujin, tu zanibe ez bi destê dewletê hatime kuştin."

Ü berya ku şehîd bibe bi çend rojekê dîsa ji pîreka xwe re got: "Dijmin gelekî li pey min digere, ez baş dizanîm wê min bikujin, lê dîsa jî ez ji ser doza welatê xwe venagerim û gerek hûn jî venegerin. Ku ez mirim li pey min megirîn; lê bilîlin. Ji ber ku bi kuştina min, têkoşîna me nasekine û ez bawer im wê hîn bêtir li pêş keve."

Belê dijmin welatparêzek din jî qir kir, lê bi vê qirkirinê gelê ku ev 12 sal in, di nava bêdengiyê de bû, awazên xwe vekir û bi dengekî bilind xwesteka xwe ya di dilê xwe de anî ser ziman û serî hilda. Carek din derket ber çavan ku gelê me êdî bi terora dijmin û qirkirinê şerê taybeti natemire û tirsonek nabe; hîn bêtir hisyar dibe û li doza xwe û li şehîden xwe û li welatiyê xwe û li masfîn xwe xwedî derdikeve û ev jî nîşana nîzîkbûna serxwebûna gelê me ye.

Dewlet, ji tîrsa şiyarbûna gelê Kurd, di nav panîkeke mezin de ye. Qomando û tîmîn dewletê de dest wan de tîvingen wan di cîpan de li nava Melazgîrê tax bi tax dîgerin. Gelê Melazgîrê naxwaze çav bi wan bikeve û ji wan nefret dike.

# KONEVANIYA NÛ

Şores Dicle

## Hikûmeta Amerîka li Başûrê Kurdistanê

D i nava civakê de meclîs idare û kargêriya herî bilind û mafdar e, çîma? Ji ber ku bi biryara pirranya gel tê damezirandin. Biryaren ku ji hîla vê saziya gel ve têne der jî, biryaren gel in.

Di hînek welatên weke Tirkîyê de meclîs bê hîkari dimînin. Parlementerîn di parlamentoyê de mirov dikare bibêje şekli ne. Biryar ji hîla saziyeke din ve têne standin, ev sazî her kes dizane artêşâ Tirk e. Ji lew re dubendî û nakokî di navbera gel û hikûmetê de derdi Kevin.

Em werin ser "Meclîsa" li Kurdistanâ Başûr.

Li Başûrê Kurdistanê niha dîlanek li ber zirneya Berzanî û dahola Telabanî digere. "Meclîs hatîye çêkîrin, piştî "meclîse" ji niha li gora çapemeniya di bin hîkariya dewletên Rojava de "hikûmet" hatîye çêkîrin, ji wê "hikûmetê" ji "wezîr" hatine tesbit kîrin.

Berî ku "meclîse" çêbikin "serokên PDK û YNK dîsa çenteyên xwe hilgirtin û berê xwe dan paytextên Tirkîyê, Fransa, Îngîlîstan, Almanya... û hînek welatên din ên dagîrker. Gelo, li wan welatan ci xwestin?

Edî tiştîn bi dizi û veşarti ne mane, ji lew re em her tiştî eşkere dibêjin. Ev "Serok" eşkere dibêjin: Eger Amerîka alîkariya me neke, em nikarin li Başûr nefesa xwe bikşîn. Wê Séddam êrişen xwe yê hovane bîne ser me, ji ber vê yekê em ji hîla hevalbend ên çalak dixwazin ku ji Başûr neçin...

Hîna zikê wan ji hestiyen Amerîka û Roma reş têr nebûye. Em dîroka wan a ketin û têkçûnê mirinê şîrovenekin, ji ber ku ev rûpel têra wan nake.

Gîring e were zanîn ku "hikûmeta" çêbûyi bi destê Amerîka, Tirkîye... û çend dewletên dagîrker ên din in. Ji ber vê yekê biryaren werin standin ji, wê ji hîla wan dewletan ve werin dayîn. Anglo biryar ne yê me ne, daxwaza me niha ev e, rastiya "meclîse" ji hîla herkesi ve eşkere bibe.

Em 30 milyon kes in, tu caran ne hewcedarên dagîrkeran in ku werin ji me re "meclîsen" wiha sexte ava bikin. Eger xwîn bibe lehî ji, emê bixwe meclîsa xwe ya neteweyî ava bikin, ev mafê me ye.

Belê em ne ewqas bê çare ne, ku yê xwîna me dimijin bi F104'an gund û konen me wêrân dikin werin li ser serê me weke berê bibin xwedayen me yê li ser rûye erdê. Ji ber vê yekê û gelek "yekê" din, em vê meclîsa" dagîrkeran li ser axa welatê xwe qebûl nakin, ji ber ku me çênekiriye, bi xwêdana eniya me nehatîye çêkîrin. Bi darê zora kolonyalistan çêbûye, na! Hezar carî na, ji vê "meclîs" û "hikûmeta" sexte re.

## Jİ KURDÊN Lİ BAŞÛRÊ KURDISTANÊ RÊ!

Edî bes e. Di nava van 46 salan de PDK ci anî serê we? YNK çawa dest da desten Seddam (di 60' an de) û hûn ji xwe re kirin hedefen tifîgan? Hûn ci zû tiştan, bûyeran û kirinê xayînan ji bîra dikin!

Vê carê ji dixwazin bi navê avakirina "meclîse" "hikûmetê" û "wezaretê" we bixapînîn û bikin parîyen devê dagîrker û bavkujan. "Meclîs û hikûmeta" hatine çêkîrin ne yê me ne. Hûn çawa qebûl dikin dijmin we ji derve ve idare bîke!

Qebûl nekin! Serê xwe hîldin, hûn mina berê ne bê piş in, edî şeref û namûsa xwe ji destê Tirk û dolivgeren derve derxîn. Bes e, hûn di nava dînyayê de rezil û riswa kirin. Herin ji xwe re binêrin, li her derî dînyayê hûn penahberen bê xwedî ne, ew li we xwedî ji dernakenin.

Dilana li ber zirneya Berzanî û dahola Telabanî, ya mirinê ye, xwe biparêzin. Bila dîsa Başûrê Kurdistanê yê şîrin nebe bûka di nava qil û lingén leşkeren Amerîka û Mehmetçikén Tirk ên diranserek de. Hûn çawa layiq dîbinin Başûra delal careke din bibe mîtingeheke dijmin?

Em desten we ji bo serxwebûn û azadiyê diguvêşin û xebata we xweş be!

## Dewlet çavtirsiya dide gel

Ev nîzîkî du sê meh e dewlet bi taybeti pest û zordariya xwe li ser Melazgîrê didomîne. Lewra li Melazgîrê roj bi roj welatparêz zêde dibin û li ber neheqîyê radibin. Ji bo ku gelê Melazgîrê bitirse û dengê xwe bibirre, dewlet welatparêzân digire û işkencê li wan dike.

Dewlet, ji tîrsa şiyarbûna gelê Kurd, di nav panîkeke mezin de ye. Qomando û tîmîn dewletê de dest wan de tîvingen wan di cîpan de li nava Melazgîrê tax bi tax dîgerin. Gelê Melazgîrê naxwaze çav bi wan bikeve û ji wan nefret dike.

Polîsîn dewletê roja 5 û 6'ê

Tîrmehê dest bi girtina mirovên welatparêz kirin. Di nav wan girtian de mele û endamên HEP û jî hebûn. Mirovên ku dihatin girtin dema sebebî girtina xwe dipirsin polîsan wiha bersiv dida: "Em jî nizanîn, şuba siyâsi ya Musê we dixwaze."

Ji navenda Melazgîrê û ji gundêne wê zedetirê 30 mirov hatin girtin û xistin nezaretxanê.

Ji van girtian yê navên wan hatine tesbit kîrin ev in: Mele Evdilcebar Kahraman, Zeki Solmaz, Kerem Soylu (endamî HEP û), Milazim Köken, Cemal Keklik, Mele Evdirehman Demir. *Welat - Melazgîr*

Romanya; bi çandinî û werzevaniya xwe welatekî gelekî dewlemend e. Lé mixabin, nikarin ji wê dewle-mendiyê qezenc bikin, teví wê dewlemendiya xwe jî, welatekî herî xezan e.

Ciyayê Romanya bi pêñûsê nayêñ ziman, mirov hez dike ji xwe re lê binêre. Quntê wan xwe di nava ewran de vedişerîn, ev ne wesfeke edebî ye, lê rastiye k e ez li ser vê rüpelê tînim ziman, bi rastî welatekî mîna Kurdistanê, gelekî sox û bedew e. Mixabin makîneya fotografan. Ji bo rojnameyê bi min re tunebû, ku ez çend wêneyan bikişinim.

Gelekî şeniyê Romanya birçî ye, ev birçibûn gihiştiye radeyekê ku dizî û gelek tiştîn din ên dûrî ehlaq û edeba mirovahiyê bikin, eşkere keçen wan xwe li kolanan difroşin, dikarin ji bo standina dolerekî hemû tiştî bixwe bikin. Rast e mirov nika re civakê li gora beşike civakê bipîve, lê hema her kesê ku derbasî Bukureşte bibe dikare yekser vê rastiye bibîne, cihê mixabinê ye. Kes xwedî li şenî, kolan, tax û çelengiya bajêr (Bucureşti) xwedî dernakeve. Herkes weke bajarê dijminan lê dinêre. Tu kesek li çelengiya wê xwedî dernakeve, ji lew re mirov dibêje qey kolan sergoyêñ gemarê ne, heyf û mixabin ku Bukureşte têkeve vê rewş! Li aliye kereçiyen ku çarikekeke şenî ne û li aliye din Tirk, ji dizî, tazîki-rinê, rîbirîn û xwefirotinê bêhtir tiştîk nakin.

Tu hîkariya polisê dewletê li ser bûyerên nedihatîn.


*Romanya, welatekî bê xwedî (2)*

# Kuştina Çawçîsko çare bû?

## D İ L B İ X W İ N

dîqewimin, çenabe. Her kesek dikare mîrekî bikuje, sed dolarî bide û nekeve zindanê. Bi vî rengî jiyana bi tirs dimeşe. kes newêre pişti saet 10'ê êvarê ji mala xwe derkeve. Diz, mirovkuj û serseri pirr bûne.

Dema ku mirov li kar û barê Romanîyan dinêre, dibêje qey di koçbera civaka destpêkê de jiyân dibin. Ji cotê wan ve bigire û heyâ bi siwarbûna li trambayan. Li gora pêşveçûna bi mirovahiyê re hatî çekirin bi pêş neketine gelekî li paş mane. Ev jî paşverûtiya "sosyalîzmâ" wan diyar dike. Gelek caran me ji xwe re dinêrî û digot: Wekî rewş ev bû, sed carî biji ji ew kesen ku li diji vê sosyalîzma sexte derdikeyin. Dîmenên ku em dibînin ji sedî sed li diji sosyalîzmê ne. Di sosyalîzmê de birçibûn, dizî, mirovkuji tune ne. Sosyalîzm wekhevî, demokrasî û jiyaneke şérîn e. Wek hemû welatên "sosyalîzm" li Roman ya jî, teorî û pratîka sosyalîzmê ali hev nedihatîn.



Cawçîsko

### EV SOSYALÎZMA ÇAWÇÎSKO BÛ

Ji bo ku em rewşê bas nas bikin me ji profesorekî Romanî çend pirs kirin:

-Hûn dikarin ji kerema xwe re Romanya di dema çawçîsko de û pişti dema çawçîsko bi me bidin naskirin.

Profesor gelekî rewşenbîr bû, nêrîneke wî ya kûr li ser pêşveçûnên siyasi yêñ li cîhanê çedîbin hebû. Kesereke kûr kişand bersiv da:

"-Romanya çû, zehmetiya ku me di ber Romanya de dît tu kesî di ber welatê xwe de nedîtiye. Lé mixabin hûn dibînin, welatê me bûye pariye devê her kesî, kesek lê xwedî dernakevê.

Çawçîsko di bin nâvî sosyalîzmê de em birçî hîstibûn. Em kor, kerr û lal hîstibûn. Ez hemû tiştîn. Sosyalîzmê baş nas dikim, li welatê me tiştîk tune bû ku navê wî Sosyalîzm be. Çawçîsko hemû tiştîn ne baş dikirin û digot: Ev sosyalîzm

e, ev komunîzm e. Ji ber vê yekê gel ew sosyalîzm nexwast. Ev nexwastina gel ne ji nebaşıya sosyalîzmê bû na! ji nebaşıya wan kesen ku bi navê sosyalîzmê bi rûmeta gel dilîstin. Ji bo vê yekê ez nabejim sosyalîzmê iflas kir, lê sosyalîzma çawçîsko iflas kir.

Rast e, hînek tiştîn baş li

## GOTİN

Yaşar Kaya



### Dîroka me Kurdan tarî ye

Ronakbirên Kurdan li kuderê ne? Kurd çima R bi dîroka xwe nizanî? Dîroka me yê ku biyaniyan nîvîsiye çiqas rast e? Ev giş meseleyê li pêşîya me ne. Ji sedsalan ve agirê li welatê me nemiriye. Kurteçiroka welatê me ev e; xwîn û barûd.

Serhildana pêşî di sala 1806 an de ji teref Babanzade Abdurrahman Paşa ve destpêkir. Di dû wî re, di sala 1812 an de, li Silêmanî Babanza Ehmed Paşa dest bi serhildanê kir. Di sala 1820 an de serhildana Zazayan, 1830 an de li Çiyayê Sîncarê serhildana Ezidiyan çê dibe, di 1833 an de ji Mîrî Eşîra Soran Mîr Muhammed serhildanek li dar dixe. 1831 destpêka serhildana Bedirxaniyan e. Dema Waliyê Misrî li Nîzîpê ordiya Osmaniyan hêşir digire, Bedirxan ji li hember Osmaniyan dest bi ser dike. Di sala 1847 an de wî li kela Duhok (Erûh) ê teslim digirin, sirgûnê Girîte dîkin, di 1868 an de diçe ser heqîya xwe. Kurê Bedirxan, Behîri di serhildana Şêx Ubeydullah

(Nehrî) de alîkariyê dide wan, kurê din Mîhat, li Misrî Kovara Kurdistan derdixe, neviyê Bedirxan Sureya, Celadet û Kamûran heta mirina xwe ji bo serfiraziya welat têkoşîna xwe didominîn

Di sala 1834 an de, li Bedîsî, Xanê Bedîsî Ehmed Şerif Xan, li hember dewleta Ali Osman serî hildide Di 1839 an de eşîrén Xerzan serî radikin. Xwarziyê Bedirxan beg Yezdan Şîr di sala 1855 an de li Bedîsî dest bi ser dike, heta Mûsûlî gellek bajaran bi dest dixe. Sala 1877 destpêka serhildana Bedirxan Osman Paşa ye ku li Mîrdînê û li Cizîra Botan dest pêkiribû. Di sala 1880 an de Şêx Ubeydullah dest bi serhildanê dike, Şêx Ubeydullah di sala 1908 an de li bajarê Mekke Wefat dike. Kurê wî yê mezin Seid Abdulkadir, bi Şêx Seidê Paloyî re li Diyarbekir bi dardekirin. Sala 1889 destpêka serhildana Emin Eli Bedirxan Paşa ye. Di sala 1912 an de li Mîrdînê serhildana Bedirxaniyan, Xelîl û Eli Remo destpêkir. Serhildana Şêx Selîm û Şahabettin Eli li Bedîsî de sala 1912 an de destpêkir. Serhildana Koçgîri di sala 1920 an de, yê Nastûriyan di 1924 an de, serhildana Zilanê û Şêx Seidê Paloyî ji di sala 1925 an de destpêkir. Wekî din, di sala 1925 an de serhildana Zilan, Serhildana Şemdin, serhildana Reşkotan û ya Ramanyan ji li dar dikeve. Di 1926 an de ji, li Duhokê serhildana

Yaküp Axa, serhildana Perwarî, serhildana Guyan û Çolemêrgê, li Nîsêbinê serhildana Haco Axa, serhildana Qoçuşaxi, serhildana Beytuşebab û serhildana Agîrî li dar dikeve. Di 1927 an de serhildana Bîcar, 1928 an de serhildana Resûl Axa li Zilanê, di 1930 an de li Tütaxê serhildana Eli Can û serhildana Oremarê, di 1934 an de li Motkî serhildana Bubanan, di 1935 an de serhildana Sasonê, di 1937 an de ji serhildana Dêrsimê dest pêdike.

Ev 150 sal in li Kurdistanê barûd, gulle û xwîn dirije. Ji devê tivingan, li zarok û jinan mirin dibare, xwîna sor dibe gol, bindestî, tîrs, xof, sirgûn û lêxistin dibe jiyana gelê me, çima?

Gelê Kurd vê jiyana bindest heq nekiyî, gelê me xistîne bin zilmeke dijwar, jê re şan û şeref nehiştine.

Ev 150 sal in li Kurdistanê agirê serhildanê venemiriye, gelê Kurd zehf şehîd daye. Koledar ji vê zilma xwe tu fêde nedîtine, ji bo çareserkirina pîrsê yek riyek tenê heye, ew jî riya demokrasî, mafdayîn û biratiyê ye.

Lazim e ku Kurd ji herkesi pîrrir bi dîroka xwe zanibin. Dîroka me xwîn e, barûd e, kuştin e, sirgûn e, mirin e, dadgeh in, İstîqlalîn Şerqê ne. Divê em bi van zanibin.

Ev dîroka tarî, dernekeve ronahiyê, em nikarin bizanibin rastî ci ye!.

vir hebûn. Weke: Her kes dixebeitî, kesekî li ser pişa kesekî din nedixwar. Pirsa xaniyan û niştecihkîrinê hatibû çareserkirin, kesek bê xanî tune bû, wekheviyeke baş di nava gel de hebû. Ev jî hînek ji taybetiyê sosyalîzmê ne. Lé li aliyê din gel birçî bû. Nan tune bû bixwara, dema ku mîvanek bihata cem me, em diheyîrîn. Nan, şekir, zeyt, goşt, birinc... bi bonan bûn.

Rojê tenê du saet ji me re destûr hebû ku em li televîzyonê temâse bikin, ji du saetan bêhtir TV nedixebeitî. Wekî din pasport ji me re dernediketin, me nedikarî em bi serdanan biçin welatîn din, qedexe bû. Em di Romanya de wek girtiyan bûn.

Birçibûn, tazîbûn, korbûn... me têr xwarin nedixwar, ji xwe re bihizire, di mehê de tenê ji te re 12 hêk û du-sê kilo goşt derdi-kevin, bi fişan me xwarina xwe dikirî.

Birçibûna gele pirr zor e, dibe sedema xistina sistemê. Xwendevanekî di derbarê vê pîrsê de gote me: Eger xwarin û wîskiya Romaniyan hebûya nêzîkî çawçîsko nedibûn.

Profesor domand û got: "Her wiha çawçîsko di bin navê sosyalîzmê di dîktatori-yet dimesand. Herin li Qesra (piştre me çû dît) wî binêrin, di cîhanê de eger ne ya yekemîn be, ye duyemîn e. Ev ci sosyalîzm e, ev neheqiyek e ku bi sosyalîzmê tê kirin, divê neyê qebûlkirin."

### HESTÎ Jİ GOŞT XWEŞTİR E

"Bi xwe mîna padışahan jiyan dibû em ji weke keran ji serî beyanê heyanî rojava dixebeitîn. Gotineke wî ya meşhûr heye, her demê digot: Hestî ji goşt xweştir e!" Goşt difirote derve û hestî ji me re dihîst.

Berê xwarin tune bû, niha xwarin heye lê kes nikare bikire. Her tîst li gora Dolaran tê hesibandin, em jî bi Ley (pereyê Romanî, her Dolarek 350 Ley dike), mehame 15.000 Ley e, li gora buhabûnê ev têra pênc rojan nake, 40 Dolar dikare ci bike! Mehê ez nêzîkî 40 Dolarî distîn, her şûşeyekê kolayê bi 400 Lîyî ye, her nanek bi 12 Leyan e, henr kîloyek penêr bi 350 leyî ye ku têra rojekê nake ji bo malbeteke wek ya min. Gel mecbûr bû ye diziyê bike, her wiha malbek mecbûr bûne xaniyan xwe bi kirê bidin xerîban... Em çawa bikin, çare ci ye?!



## Ercan Kanar bombekirina Şemdinan protesto kir

Serokê şuba Komela Mafêni Mirovan a İstanbulê Ercan Kanar bombebarankirina deşta Silo ya şemdinli protesto kir. Wek ku te zanîn hefteya buhurî balafirên ordiya Tirkîyê deşta Silo bombe kiribû û zarok û jin hatibûn kuştin.

Dûre jî dewlet di daxuya- niya xwe de gotibû bombe ji balafirê bêhemendî ketine.

Li ser vê bûyerê serokê KMM ya İstanbulê wiha got: Bi bomberanan kuştina gundiyen Kurd, ku zehfen wan jin û zarok in, qirkirin û qetliam e.

Tê xwestin ku gelê Kurd careke din wek trajediya Agiri, Zilan û Dersim bê qirkirin.

Dewleta Tirk li peyjenosîda (ji holê rakirina) gelê Kurd e. Em hemû kesen ku welatparêz û alîgirê parastina mafêni mirovan in, vedixwînin da ku li dijî van qirkirinan rabin û mafê tayînkirina çarenûsa netewaya Kurd bipêrezin, û bînin ziman.

## Mücadele hate komkirin

Komkirina kovar û rojnemeyan domdike. Her roj dadgeha evlekariye dest datine ser kovarek, rojnameyek an jî pirtûkek.

Nahêle û rînade ku rojnameyan û nivîskar rastiye bînin ziman. Vê heftiyê dîsa rojnameyek hefteyî "Mücadele" hate komkirin.

Rojnameya mücadele Li ser vê komkirin ev daxuyanî kir: "pesta dewletê ya li ser çapemeniya şoreşger û welatparêz dom dike, em vê pest û zordariyê û êrisen ku polîsen dewletê dibin ser xebatkarê rojnameya Özgür Gündemê jî protesto dikin".

# Biratiya Kurd û Tirkan

● Li gor dîtina min beriya ku em bêjin Kurd û Tirk bira ne, Kurd û Ereb bira ne an Kurd û Faris bira ne, divê em biratiya Kurd û Kurdan bînin ziman. Divê em li ser yekîtiya Kurdistanê rawestin. Divê em rastiya netewaya xwe û rastiya dijiminê xwe zanibin. Divê em ji dîroka xwe dersan bistîn. Heya ku Kurd ji hevdû re nebin bira, Kurdistanê serbixwe azad û yekbûyi ava nekin, ji Ereb, Faris û Tirkan re nikarin bibin bira.

### Felat Dilges

Di van demen dawî de, li ser biratiya Tirk û Kurdan gelektiştîn gotin. Ev naverok di hemû rojname, kovar û weşanen ku ji alî Kurdan ve tê derxistin de heye. Bê guman ji biratiyê xweştit tîstek tune û divê neyê

Türkeş û Ecevit ji dibêjin Tirk û Kurd bira ne û hezar sal e ku bi hevdû re dijîn. Ecevit hergav dibêje: "Pirsa kurdî tune, pirsa Başûrê rojhilat heye û ev ji pirseke aborî ye; pirsa Kurdi pirseke etnik nîne."

Berî her tişti divê ku serê me zelal û mîjiyê me çalak be. Divê ku em bizanibin ka em ji



Wê ev herdu meş di cohektî de bigihin hev û wek çemeke gur vê rejîma faşîst bidin ber pêlén xwe û belav bikin.

fêmkirin ku ez li hember biratiya Tirk û Kurdan im. Na, ez biratiyê dixwazim û ji biratiyê gelektiştîn. Li ba dilê min hemû gelên dinê bira ne û divê ku bi bîratî ji bijîn. Riya aşîti, aramî û wekhevîye di biratiyê re derbas dibe. Lî biratiyek çawa? Divê li ser vê pîrsî bê rawestin.

Tu kesi bi qasî me Kurdan ji bo pîkanîna biratiyeye rastin têkoşîn nekiriye û xwîna xwe neretiye. Di mijara biratiya gelan de em ewqas nefsiçûk, diltenik û dilovan in ku dikarin xwe û gelektiştîn xwe feda bikin. Xorten Kurd, di qada şer de, di girtigehan de, li ber darê sépiyan ji, biratiya gelan parastin û hê ji diparêzin. Me Kurdan gelektiştîn di şerê navbera Filistin û İsrail de ji xwîna xwe rêt; biratiya gelan bindest anî ziman û piştigiriye ke rasîn bi gelê Filistin re kir. Lî dawiyê ci bû? Em piştigiri û biratiya gelê Filistin deynin alîkî, hê ji devê wan nagere ku ji têkoşîn û tevgera rizgariya gelê Kurdistanê qal bikin. Di qirkirina Helebçe de, berî hemû kesi serokê Rêxistina Rizgariya Filistinê (RRF) Yaser Arafat Seddamê xwînxwar ziyaret kir û desten wî yêni bi xwîn guvaşti.

Siyasetkarê burjuwaziyê, Tirk ên wekî Demirel, İnönü,

Ji demeke dûr ve ye ku bala min dikşîne, ew hêzên siyasi yêni ku li ser çar perçen Kurdistanê xebatêne xwe yêni siyasi didomin, bi pirranî siyaseta xwe ne li gor yekîtiya Kurdistanê û bi hev re jiyanâ gelê Kurd, lê li gor ew şeqayê ku li ser dijîn û yekîtiya Kurden wê derê û gelê dewleta mîtinger ava dikin. Herwiha hêzên siyasi yêni Başûrê Kurdistanê wekhevî û biratiya Kurd û Ereb, an ji İraqê re demokrasî ji Kurdistanê re otonomî, di van demen dawî de ji, li Bakurê Kurdistanê li ser federasyona Kurd û Tirkan tê axaftin. Diyar e ku bi peyva Kurdistanê, mebest ne tevê Kurdistanê ye.

çareser bibe nîne. Di binê avahiya dewleta unîter de ji çareser dibe" (Özgür Gündem, 11 Tîrmeh 1992)

### BERÎ HER TIŞTI YEKİTİYA KURDAN

Ev mantik domandina siyaseta Kemalîzmê ye. Kemalîzm jî dikare xwe li gora mercan biguherîne; hergav ne pîwîst e ku bêje "Kurd tunin." Mafê çarenûsî di ava kirina dewleta serbixwe re derbas dibe. Pirs pirsa Kurdi ji nîne; pirsa Kurdistanê ye; pirsa Kurdistanek serbixwe azad û yekbûyi ye.

Li gor dîtina min beriya ku em bêjin Kurd û Tirk bira ne, Kurd û Ereb bira ne an Kurd û



Hemû kesi ji biratiya Kurd û Tirkan, Kurd û Ereb, û Kurdan bînin ziman. Divê em li ser yekîtiya Kurdistanê rawestin. Divê em rastiya dijiminê xwe zanibin. Divê em ji dîroka xwe dersan bistîn. Heya ku Kurd ji hevdû re nebin bira, Kurdistanê serbixwe azad û yekbûyi ava nekin, ji Ereb, Faris û Tirkan re nikarin bibin bira. Lewra beriya ku em bibin bira, divê em bibin cîranen hevdû yêni baş. Ez tu têgihekê nadim daxwaza Kurdeki Kurdistanâ Bakurê ku bi Tirkekî re li İstanbulê jiyanâ di serê xwe re derbas dike, lê li Mehabad, Efrîn an li Silêmaniyê di nav birayen xwe yêni Kurd de jiyanê nafikire.

Faris bira ne, divê em biratiya Kurd û Kurdan bînin ziman. Divê em li ser yekîtiya Kurdistanê rawestin. Divê em rastiya dijimin qal dikin. Lî li ser pirsa biratiya gelê Kurd û yekîtiya Kurdistanê nayê rawestin. Di van demen dawî de, pirsa dewleteke Kurd a serbixwe ji, ji rojêvî derketi xuya dike. Heya hinek sosyalistîn Tirk ên "jî", pirsa kurdi li Tirkîyê di nav çarçova dewleta unîter de ji çareser dikin. Yek ji wan Mihri Belliye. Ew di hevpeyvîna xwe ya Rojnameya Özgür Gündem de wiha dibêje: "Di vir de kirina herî baş, polîtiqaya herî baş, tişte ku di riya avakirina biratiya herdû, gelan de tê kirin e. Li gor dîtina min ev ji, tiştekî illa ewê bi federasyonê an ji illa ewê bi serxwebûnê

## Weşanen Pelê Sor

### ANTOLOJİYA HELBESTVANÊN KURD

(Kürt Şairleri Antolojisi)

Ji Elî Herîrî ta

Seydayê Keleş...

Ji hemû Kurdistanê

jîyanâ 64 hozanvan û

helbesten wan ên bijarte...

**Bİ KURDİ**

456 Rûpel, 38.000 TL

### CEGERXWİN

Kîne Em?

Jiyanâ

Seydayê Cegerxwîn  
û ji 8 diwanen wî  
helbesten bijarte...

**KURDİ - TIRKİ**

Çapa duyemin

416 Rûpel, 34.000 TL

DERKET

Weşanen Pelê Sor. Divanyolu Cad. Hoca Rüstüm Sk.  
No: D:12/1 Cağaloğlu/İST Tel-Fax: 511 37 31

Cenazeyek, qirkirinek û daweyek

# Îdîaname xerîta Kurdistanê nîşan dide

● Dozgerê vê daweyê, dema ku îdîanameya xwe amade dikir, nizanibû ku wê belgeyek girîng û dîrokî ji Kurdistanê re bihêle. Li gor baweriya min, di rojên pêş de, dê dîrokvan û polîfikvan vê belgeya dîrokî pîr baş bi kar bînin. Ji bo vê jî, em ji dozger re çiqas spas bikin hindik e.

## Mustafa Demir

Piştî hejmara 20 an ya rojnameya me, ez şehîdê me yê nemir Wedat Aydin bi bîr tînim û slavên xwe ji Welat û xwendevanê Welat re pêşkêş dikim.

Di vê nivîsa xwe de ezê bi avayekî din li ser şehîdkirina Wedat bisekinim. Wedat kî bû? Cîma hat kuştin? Û dawî ci bû?

Wedat, berf her tişf rewşenbûr, welatparêz, leheng û serokekî gelê xwe bû. Ew ji nav gelê xwe derketibû. Di têkoşîna gelê xwe de, di rîfîn pêşî de û şervanekî bi bawerî bû.

Ji xwe sebebê kuştina wî jî ev bû. Hêzên serdest û qatilêwan ên xwînxwar, xwestin ku bi kuştina Wedat, xof û tirs bixin dilê gel û bi vî awayî pêşîya têkoşîna neteweyî bigirin. Lê ev hesab negirt. Piştî kuştina Wedat, Diyarbekir bû şahidê serhildanek dîrokî. Wedat, di vê serhildanê de jî, li pêşîya gelê xwe di rîfîn

pêşî de cihê xwe girtibû. Ew xof û tirsâ ku xwestin têxîn dilê gelê Kurd, ketibû dilê wan.

Divabû ku ji vê tirsâ xwe rizgar bibin, êrîşî 100.000 mîrovê Kurd ku ji çarmedorê Kurdistanê hatibûn pîroziya şehîdê xwe, kirin. 22 kes hatin kuştin li seriya 3000 însan birîndar bûn û 354 kes jî hatin girtin.

Evet tiştên ku heta niha min nîvîsand, ji xwe têr zanîn. Lê, ezê bi taybetî li ser mehkeme-kirina girtiyen piştî qirkirinê rawestim û ji van mehkeman çend taybetiyen balkêş pêşkêş bikim.

Serdozgerê Dadgeha Ewlekî ya Dewletê, di dermafê 354 kesî de dawe vekir, ku pirraniya wan birîndar hatibûn girtin. Di nav wan de berpirsiyar û mebûşen HEP ê 119 kesen ku rakînbûn nexweşxanan jî hebûn.

Dozgerê vê daweyê, dema ku îdîanameya xwe amade dikir, nizanibû ku wê belgeyek girîng û dîrokî ji Kurdistanê



Di îdîanamê de erdnîgarek (coğrafya) tesbît kirine. Ev erdnîgar, çiqas bê İnkarkirin ji Kurdistan e. Lewra di vê dadgehê de yek (1) Tirkef tenê heye, ew jî, ji Sêwazê ye. Yê din hemû ji bajar, navçê û gundûn Kurdistanê ne. Bi vî awayî jî, tixûbek hatiye tesbît kirin.

re bihêle. Li gor baweriya min, di rojên pêş de, dê dîrokvan û polîfikvan vê belgeya dîrokî pîr baş bi kar bînin. Ji bo vê jî, em ji dozger re çiqas spas bikin hindik e.

Ez dixwazim, li ser çend xalêñ vê îdîanameyê rawestim.

1- Di vê mehkemê de kuşti, birîndar û işkencexwarên serhildana Diyarbekir bûne mehkum, yê qatil û işkencekar ji bûne mexdûrên vê daweyê.

2- Ev îdîaname baş şanî me dide ku, ev qirkirin bi hevkariya Midûre Ewlekariya Diyarbekir, Waliyê Rêveberiya

Taybetî, Wezîrê Hundir û Serokwezîr hatiye kirin.

3- Îdîaname bi giştî, li ser cudakirina' nîjadê (ırk) û bi zîhniyetek nîjadperest amade bûye. Li gor îdîanamê "besdarê cenazê hemû Kurd in, ji ber vê jî hemû tewanbar (suçlu) in."

4- Di îdîanamê de erdnîgarek (coğrafya) tesbît kirine. Ev erdnîgar, çiqas bê İnkarkirin ji Kurdistan e. Lewra di vê dadgehê de yek (1) Tirkef tenê heye, ew jî, ji Sêwazê ye. Yê din hemû ji bajar, navçê û gundûn Kurdistanê ne. Bi vî awayî jî, tixûbek hatiye tesbît kirin.

5- Yek ji fonksiyona vê dadgehê ew bû ku, ji her çîn û meslekî Kurd gihande hev. Di nav girtiyen serhildanê de mebûş, doktor, evûqat, endez-yar (Mühendis), mamoste, xwendekar, memûr, karker, bêkar, gundî, jin, berendamê polîsiyî yanî ji her celebî mirov hebûn. Ev jî Yekbûna Neteweya Kurd ifpat dike.

Dawî, Wedat Aydin, di mirina xwe de jî, wesfî serokatiyî şanî da, piştî mirina xwe yekbûna Kurd û Kurdistan bi dijminan jî da itirafkirin. Mirinîn wiha nabin nesîbê herkesi.

"Tuyê her bijî Wedat"

## 'Dergûşa mirovahiyê Botan'

● Hêviyên ronak û rastiya zanyariyê, pêlîn çemê serxwebûn û azadiyê bilind dikin. Xwîna şehîdîn me ku heya kîliya dawiyê li ber xwe dane, navê gel, welat, partiyê û serokatiya partiyê bilind kirin, û ev hebûna me heya dawiyê diparêze. Îro em berê xwe didin welat. Vaye ez ketime ser riya çûyîna nava şerê gel. Berê min li dergûşa mirovahiyê Botan e. Zanibe hevalê min, ez li benda te bi hêviyên mezîn ra-diwestim. Bê guman, emê li wir rojê hembêz bikin.

jîyana me yêni bi hev re ji bîr bikim. Civînê me, xweşî, şahî û demê teng, ku me gelek bi hev re borandine, hêrs û hîmeke nuh her gavê didine min. Ew rewanê şoreşger, ku me di rojê pêşîn ên bi girêdana Partiyê de nîşan dan, wê di nava karwaniyê de bîkele û xwe bigîhîne bilindahi-yekê û wê xwe bike nirxeķî mirovahiyê yê pîroz. Baş tê bîra min, me çawa şerê reformist û sextekaran dikir. Wê demê gelek tiş tevlîhev dibûn. Her kesek dikaribû xwe bi gotinan weke mirovahî herfi radikal bida xwiya kirin. Belê, êdî ew virr û derewen wan nema dimeşin. Ew tiro nema dikarin zikê xwe yê

birç jî têr bikin. Xwîna şehîdîn me Dijwar, Fîraz, Reşîd û hevalê din nefesa wan a dawiyê jî birî û seriyê wan ê keçel rût xwiya bûn.

Hevalê min, tu dizanî me bi derfetîn gelekî biçük dest bi xebatê kir. Di zanîngeha Helebê de ew çend partiyê reformist em gêj dikirin, bi teoriyên xwe yêni şaş. Ji bo bikarîbin behaneyen derxînîn û di jîyana xwe de fedekariyan nekin, digotin, "Hîna hoyen objektîv û sîbjektîv ên şoreşê tune ne." Ji xwe li gora wan, hoyen şoreşê wê tu caran peyda nebin. Ji hêla din ve efendî û xûlamîn sosyalizm a reel digotin, "Eman bila Kurd xwe tev nedîn, wê aş-

tiya 'selama' cîhanê xira bibe."

Belê, rast e, zor û zehmetî gelek bûn. Lê partî bi pêvebirin û avakirina yekîtiya gelê Kurdistanê rê li pêşîya ji holê rabûna wan partiyan ve-kir. Niha ji her kesekî re baş diyar e, ji van partiyan çend malbat û kes mane.

Hevalê hêja,

Hêviyên ronak û rastiya zanyariyê, pêlîn çemê serxwebûn û azadiyê bilind dikin. Xwîna şehîdîn me ku heya kîliya dawiyê li ber xwe dane, navê gel, welat, partiyê û serokatiya partiyê bilind kirin, û ev hebûna me heya dawiyê diparêze.

Vê rojê qîr û bangêş şe-

hîdîn me yêni ku heya kîliya mirinî jî dirûşmeyen wiha hildane: "Bijî Kurdistan, bijî PKK, bijî serok APO" li ber guhêne me ne. Di riya gel û welat de heya dawiyê amade-kariyek mezin datfîne ber me. Ci zorî û ci nexweşî hebin, gi-ring e ala şehîdan bilind bîmîne. Li serê çiyayen Kurdistanê bihêje. Riya avakirina mirovahiyê li Kurdistanê ev e! Erk û delametên her mirovekî jî ev e, ku heya dawiyê xwedî li vê rastiyê derkeve.

Xebata heya vê rojê me bi hev re bi rî ve biriye, bê gu-man, amade-kariyê vê rojê bûn. Li ser vê bingehê îro em berê xwe didin welat. Vaye ez ketime ser riya çûyîna nava şerê gel. Berê min li dergûşa mirovahiyê Botan e. Zanibe hevalê min, ez li benda te bi hêviyên mezîn radiwestim. Bê guman, emê li wir rojê hembêz bikin. Di nava rîzîn gîşen gelê Kurdistanê de ku di hemû dirêjahiya dîrokê de li ber xwe daye, cih bigirin. Rastî, şoreşgerî û miroverwer li wir tenê dikarin bigîhîn wateyê xwe yên pêwist.

R. Cizre

*Bi diya Delîl û Mezlûm re hevpeyvîn:*

# 'Esqa Kurdistanê li Mezlûm ketibû'

- Mezlûm çiraya Kurdistanê bû, Mezlûm bû şeqw û ronahî ji bo gelê Kurdistanê, gelê Kurd cejna Newrozê bi Berxwedana Mezlûm hîn bû û nas kir. Heyanî ku Mezlûm cejna Newrozê bi bedena xwe pîroz nekir, me nizanî bû, bê Newroz ci ye, armanca Newrozê ci ye, bi berxwedana Mezlûmê xwe min Kurd û Kurdistanê naskir, min cejna Newrozê naskir.
- Heke ez bimrim jî, êdî ez bi kul û xem naçime gorê, lewra iro Mezlûm û Delîl rabûne ser piyan, weke herne govendê, weke dîlanê bigrin, Fêris û Egît di çiya de ne, li gund û bajara ne, ewê Kurdistanê bikine goristan ji neyar re...

*Dayika Kebîre! Tu li ser Mezlûm û Delîl û têkiliyên we ci dikarî bibêjî?*

- Ez ne dayika Mezlûm û Delîl tenê me, ez dayika Kurd û Kurdistanê me, ez dayika hemû şoreşvana me, Mezlûm û Delîl jî, ne kurê min tenê bûn, yên Kurdistanê tev bûn, ez bi dayikbûna Delîl û Mezlûm Şanaz dibim. Ez bi doz û xebata Mezlûm serbilind bûm, ez bi bîr û bawer bûm, min bi Mezlûmê xwe Kurdistan naskir, min bi Mezlûmê xwe cejna Newrozê naskir, min bi Mezlûmê xwe dijmin naskir, zilm û kotekejî ci ye, bindestî û koletî ci ye, doz û xebat, azadî û serbestî ci ye, min bi serhilda-na Mezlûmê xwe naskir. Iro bi sedhezaran, di rîza Mezlûmê min de dimeşin, li zîndanan, li deşt û çiyan, li bajar û gundan, her roj berxwedan e, her roj serhildan e, zarokê Kurdistan edî bi navê Mezlûm û Delîl mein dibim...

Heyanî doh Mezlûm û Delîlek min tenê hebû, belê iro bi sedhezaran Mezlûm û Delîl ên min hene, ez bi vê şanaz dibim, ez bi vê dilxwes, serbi-lind û bi rûmet dibim...

*Dayika Kebîre tu jiyan xwe bi kurtasî karî bînî ziman?*

- Em li Navçeya Xarpêtâ (Elazığ) Qereqoçan (Karakoçan) li gundê Seyit Mahmut (Pamuklu) ratiwestin, belê iro em li Izmitê ne, hew bavê Mezlûmê min tenê li gund radiweste, ez dayika 6 zarokan im sê qîz û sê kur, keçen min gihane mîr, ji sê kurên min Mezlûm û Delîl şehîd ketin, Delîl sê salan di şerê çekdarî de ma, dûre şehîd ket, Mezlûmê min jî, sala 1982 an li zîndana Amed di 21'ê Adarê de şehîd ket, ez û kurê xwe yê din li Izmitê jiyan xwe didominin.

*Ji kerema xwe re, di derhe-qa jiyan Mezlûm de tu dikari me serwext bikî?*

- Belê kurê min, Mezlûm ji zarokbûna xwe ve çav vekîn, jîr û zehf bi fêm bû. Mezlûm dibistana ewil, sefa pêncâ bi serifrazî qedand, paşê me qeydiya wî li dibistana mamos-tetiyyê (öğretmen okulu) çêkir, Mezlûm li ser doz û mafê gelê. Kurd lêkolîn dikir, ew ji dibis-

tanê koçî Balikesîrê kirin, dema ku dibistan qedand bû mamoste û neqla wî dane Batmanê, di van salan de jî, Mezlûm gelek caran hate girtin û kotekejî destê dewleta Romî dît, bi evqas kotekejî û koçkirinê jî, Mezlûm dev ji têkoşina Neteweyî berneda, Mezlûm bi şev û roj pirtûk dixwend û tefsîra wan ji me re dikir.

*Mezlûm weke ci pirtûkan dixwend, li ser doz û bindestiya gelê Kurd, li ser wezîfîn welat-parêzî weke ci rîzanî ji gel re kir?*

- Kurê min Mezlûm çira Kurdistanê bû, Mezlûm bû şeqw û ronahî ji bo gelê Kurdistanê, gelê Kurd cejna Newrozê bi Berxwedana Mezlûm hîn bû û nas kir. Heyanî ku Mezlûm cejna Newrozê bi bedena xwe pîroz nekir, me nizanî bû, bê Newroz ci ye, armanca Newrozê ci ye, bi berxwedana Mezlûmê xwe min Kurd û Kurdistanê naskir, min cejna Newrozê naskir.

- Kurê min, Mezlûm weke şerî Eli bû, li hember zilm û zorê şer kir, bê rûmetî nepejîrand, bê şerî nekir para xwe, şerî ji zilmê re dananî, li hember xiyanetê bingeha berxwedanê ava kir. Mezlûm bû kelemê çavê neyaran, Mezlûm bû mînaka serhildanê. Kurê min, Mezlûm bi pirtûkê Marx û Lenîn bi rîexistin bû, bi vê yekê re jî, li ser doz û mafê gelê Kurd dest bi lêkolîn, tevger û têkiliyê kir, tifaqa gel damezirand, Mezlûm dema ku pirtûk dixwendin, naveroka pirtûkê ji gundiyan re tanî ziman, gundî li hev dicivîyan, li ser doza Kurdistanê gundî serwext dikirin.

*Mezlûm di pey mamosetiyyê de kîjan zanîngeh xwend?*

- Mezlûm di pey mamosetiyyê de li Enquerê Zanîngeha Aborî (ekonomi) di Üniversiteye Hacetepe de xwend, belê zanîngeh neqedand, lewra têkoşina Kurdistanê li hîviya wî bû. Ew ji weke Kemal Pîr û Xeyri Dûrmûş ji bo rizgarkirina Kurdistanê zendê xwe vemiland û derbasî Kurdistanê bû, bi dilekî xwes û evînî dest bi kar û xebatê kir.

*Mezlûm kengê û li ku derê*



KEBİRE DOĞAN: "Ez ne dayika Mezlûm û Delîl tenê me, ez dayika Kurd û Kurdistanê me, ez dayika hemû şoreşvana me".

*hate girtin?*

- Mezlûm di sala 1981 an de li navbera Wêranşehr û Serîkanîyê (Ceylanpinar) de tevî, Yıldırım Merkit û Aysel hatin girtin.

Di işkencê de, çiqas kotekiya li dijî mirovahiyê hebû li Mezlûm kirin, bi vê kotekiyê jî, Mezlûmê min qet sîr neda, paşê Yıldırım Merkit xiyanet li doze kir û bû sîxurê dewletê. Peyde, Mezlûm hate naskirin.

*Dema ku Mezlûm kete zîndanê, te ci dikir, tu li ku derê bûy?*

- Kurê min, êdî ne şev li min şev bû, ne roj li min roj bû, ku min Mezlûmê xwe nedîtiba xewa min qet nedihat, çavê min qet nedihat girtin, dev ji xwarinê berde, av di xwîzya min de nedîcû xwarê, lewma ez çûme Amedê, li Baxlera nêzî mirata girtîgehê min xaniyek deman kir, ji bo ku ez her heftê Mezlûma xwe bibînim...

*Di wê demê de Esat Oktay işkence bi girtiyan dikir, ew malen ku li derdorê girtîgehê bûn, ji qire qira hêşîren zîndanê, zarok ji xewê vedic-niqş, xew û xwarin li dayik û bavan tune bû, ji dengê qire qira hêşîren zîndanê, gelek malbat xaniyên xwe bi nîvê heg firotin û bar kirin, qey ev qerîn û hewar ne dihatin te, li ber qerîn û zilm û zora li ser hêşîran, te li kîleka girtîgehê çawa debar dikir?*

*Ku min ev pirs ji dayika Kebîre saetekê bersiva min neda û dest bi gîf kir, qey ev rojê wehşetê dihatine bîra wê, ez bi pîrsa xwe poşman bûm, qey geleki tesîr lê kir bi zora heft bela min ew aş kir*

Kurê min, ne ez tenê, tu vê pîrsê ji kîjan dayika Kurd bikî, ewê bike qerîn, kesê gurçikê wan ji pola be jî, bersiva te nikare bide, lewra qîre qîra şeran di nava lepê roviyan de dihat, kurê min, tu kul û derdê min tev raneke, birînê min cardin venike...

*Carekê Mezlûm ji zîndanê reviya ne wisa?*

- Tew tew kurê min, bi serîte, ne ji ber ku Mezlûm kurê min e ez wesfî wî didim, Mezlûm şerî zozañan bû, Mezlûm kelemê ber çavê mijokdaran bû, Mezlûm pirtûkxane bû, kurê min Mezlûm eşqa welat lê ketibû, evîndarê Kurdistanê, evîndarê têkoşînê bû, lewma di girtîgehê de jî nedisekinî. Wê demê çopa girtîgehê bi bîdonan li deryê Mîrdînê vala dikirin, Mezlûmê min jî, di bîdonâ çopê de reviya, belê mixabin heval di wextê xwe de nehatin alîkîriya wî, lewra ev plana wî neçû serî.

*Tu carna diçûn dadgeha Mezlûm, weke ci parastinan dikir?*

- Min yek dadgehek bi tenê jî berneda, lê gelek caran dernedîket dadgehek, ji Dadger re wiha digot: "Hûn ci ne, hûn kî ne ku min dadgeh bikin, ince gelê min, min dadgeh bike". Mezlûmê min wiha digot: "Ez xelasiya gelê xwe me, ez azadiya gelê Kurd im, ez rîberê gelê Kurd im, ez rûmeta gelê xwe nafiroşim." Ku Mezlûmê min wiha digot dozger û dadger di kursiyê xwe de winda dibûn, dibûne weke pepûkan.

*Dema Mezlûm şehîd ket tu amade bûy li ser cendekê wî, weke ci eziyetê lê kiribûn, tu*

*derb di bedena wî de hebûn?*

- Belê kurê min, Mezlûmê min çend rojan cendekê wî di nexweşanê de ma. Malbata me bi tevayî çûne nexweşanê, du tilikê destê wî jêkiribûn, me pîrs kir çîma we tilikê wî jêkirine, ji me re gotin mişka xwariye, cendekê wî me bire Qereqoçanê li gundê xwe definand...

*Tu di dîlê xwe de, tu kul û xema dignî?*

- Ev ci gotine kurê min, ez bi şehîdbûna Mezlûmê xwe, ez bi berxwedana Mezlûmê xwe şanaz dibim, Mezlûmê min em kinir xwedî rûmet û şeref.

*Tu get hatiyî girtin?*

- Belê di sala 1981 an de ez û keça xwe Asyayê li Amedê hatin girtin, pişti du meh û nîvan em serbest berdan.

Berya çend rojan we gora Mezlûm û Delîl guherand sebeb ci bû?

- Li nêzî mala xwe me cihekî taybetî afirand, heyanî niha 16 milyon li gora wan mesref bûye, ewê hê 20 milyonê din jî lê mesref bibe, goristana wan emê bikin weke Muzê, cilêñ Mezlûm û Delîl hê jî li cem min in, hê jî xwîn ji cilêñ wan neçûye, di her bîranîna wan dé, ji sindoqa xwe dertînim û ji xwe re têr bêhn dikim.

*Iro tu rewşa Kurdistanê çawa dibîni?*

- Heke ez bimrim jî, êdî ez bi kul û xem neçime gorê, lewra iro Mezlûm û Delîl rabûne ser piyan, weke herne govendê, weke dîlanê bigrin, Fêris û Egît di çiya de ne, li gund û bajara-ne, ewê Kurdistanê bikine goristan ji neyar re...

*Heppeyvîn: S. Arjen*

# Moral jî nema em biniyîsinin û bistrin

H.Sefkan

Bi rastî mirov nema vala dibe ku çend rîzan binivîsîne, yan jî helbestekê bibêje. Berê, mirovê ku zanibûna stirana "Bûkê delalê" li ser sazê lêxista, yan jî çend tîpên kurdî bi latînî nasdikirin, bi hezaran pere li xwe didan û diçûne Ewrûpa, digotin li wir azadî, demokrasi heye, mirov kare karê xwe pêş de bibe. Maşelleh partiyên Kurdistanê jî mohrek li binê kaxetekê dixistin û digotin: "Ev hozanek an jî nivîskar û şâfre-kî partiya me ye, dewlet lê digeriya û..." È dî niştehî dibû û zilam an dibû 'hozanek' an jî 'nivîskarek'.

Em jî hatin vir 'Ewrûpa' me got karek ji destêne me tê emê bikin. È rojek li 'sozialamt' diçe, du roj li cem polisan û 15-20 jî li hebsê diçin. Rojek jî li 'Arbeitsamt'. Cihê ku dewlet kar dide mirov li wir diçe, rojîn mayî ji li nav millet û karê welat diçin. Anku valabûn namîne mirov çend helbestan binivîsîne an

• Èdî hêviya me ji we hozanan heye ku hûn bihêlin milet karê xwe bikin. Hozanên me yên ku hene besî me ne, têra me dikin. Derkevin lê hûn deng xweş in ne hozan in, ne ji yên Kurdan in, hûn ên "Kurd-Tirkan in" pêşî herin kursa ziman dûre werin bibin dengbêj. Ev hozanên kevin hemû ji qehra xwe nexweş ketine. Bi xwe min jî dixwest ez di vî karî de xwe li pêş bixim, lê ji qehrê we re min dev jê berda. Ji ber ku we qîmet ji hozanî û hozanan re nehiştiye.

jî bêje, ji xwe vê demê dewletêni Ewrûpî ji mirovîn mîna me bi hêsanî ber nadîn, nexasim ku mohra tu partîyan li bin kaxeta mirov tunebe, ji ber ku perê te tune bin mohr jî tune.

Li ber deriyê 'sozialamt' cihê ku peran didin penaberran (iltîcaciyan), bi rîz bûbûn, ne pirr bûn, 100-150 kes bûn. Bawer bikin te digot qey ev dinya hemû li mirov temâsedike û bi halê mirov dikene mîna ku tu rûwê Seddam û ... maçîke pê re rûnê wisa zor bû. Bi ser wî half de dengê xortekî hat bi hevalê xwe re xeber dide, bi tirkî diaxivin, digot: "Bir araba alaceym, aportiman, bir de heray yüzlerce pere göndereceyim, bir de...). Bi rastî weke ku xinceran di canê min de lêxe, xwezka ez

fêrî tirkî nebûma û min jê fêm nekira bê ci dibêje. Hema dengek ji dawiya sirê hat û wiha got: "Ha.. ha.. ha.. ancak gidersin..." ma ku em şerm bikin em van gotina dibêjin. Tu halê xwe nabîn bê tu çawa bûyî. Dê û bavê me, zarokên me li ber lingê panzêran tênu kuştin, tu jî bi erebe û malan daketyî û...

Oof, dilê min lê hênik kir. Li vegerê, pişti dan stendineke dirêj xwiya bû ku ew xort ji yekî ji yên "Bûkê delalê" ye, anku qaşo hozan e. Kaseta xwe jî diyarî da min, pişti ku min lê guhdarkir, min nexwest ez li cem xwe bihêlim!.. Çima? Ji ber ku her stiranek ji cihekî dizîye, bi kurdî jî nizane, bi xwe jî nizane bê ci dibêje. Cumleyekê, gotinekê rast nabêje.

Ne ew tenê. Bi rastî ev

hozan mozanê ku nuh derketine û derdi Kevin (maşeleh ji "martiyen" welêt bêhtirin) Rojê yek derdi keve, her yek jî dibêje ez û ne kesî din. Xwezka zanibûna bi kurdî jî, bilaba, lê ne nizanin bê ci dibêjin, muzîkên ku dibêjin hemû male diziye ne. Binêrin "Hozanek" yê ku helbestekî Aramê Dîkran dibêje. Çawa tîne ziman. Aram dibêje: "Di mala apê hecî de". Hozanê hemdem jî "çûkê cil ziman" wiha dibêje: "Benîst di apê hecî de." Hûn bi xwedîkin, mala apê hecî li ku û benîst li ku?

A min e ku hin Aram distrê jî. Her wiha muzîkên wan her perçeyekî ji hozanekî dizîne, carna ji helbestê bi tevayî û roj li nîvro didizin û dikin male xwe, wek "Dunya, Dunya", bi rojan hozan

Xemgîn li ser sekiniye paşî ji dikin malê xwe. Li gelek cihan jî, bi ser halan de dinivîsin: Gotin û muzîk "filankes". Navê xwe dibêjin, an jî rastkirin. Min berhevki-rin û nuhkîrin dîtiye lê rastki-rin tiştekî nuh bû.

Èdî hêviya me ji we hozanan heye ku hûn bihêlin milet karê xwe bikin. Hozanên me yên ku hene besî me ne, têra me dikin. Derkevin lê hûn deng xweş in ne hozan in, ne ji yên Kurdan in, hûn ên "Kurd-Tirkan in" pêşî herin kursa ziman dûre werin bibin dengbêj. Ev hozanê kevin hemû ji qehra xwe nexweş ketine. Bi xwe min jî dixwest ez di vî karî de xwe li pêş bixim, lê ji qehrê we re min dev jê berda. Ji ber ku we qîmet ji hozantî û hozanan re nehiştiye.

Hin nivîskar jî hene, gotaran (meqalan) werdigerînin kurdî navê xwe li bin dixin û dikin male xwe û ji xwe re dibêjin ez nivîskar im.

È ma ku zimanê me jî hebe we moral nehiştiye ku em binivîsinin û bistirin bavo!

## No lec qandê şarê ma, qandê welatê ma hemin o!

Cumalî Cotkar

Ze yeno zanayış, mileta Kurd şeş-hewt hezarî serî vêşêriyo, erdo ku ma nika cirê vanê Kurdistan sero roşeno û maneno. No erd ji tarîx do bol verî ra heta ewro erd ê ma yo, welatê ma yo. Peyra milêti bînî ku werî qebile biy, yenê no erd ser û bi zorê xo wazene cayê ma ji ma ra bigîrê. Mileta ma kişenê, sîrgûn kenê, ziwanê xo bi finayışa müsne nê ma, ma çekenê zîndanan û erdê ma talan û wêran kenê.

Wextê yeno, mileta ma bi xo hesêno û wazeno bi xo werê erd û welatê xo bo. Qandê ney û waştişê bînî mileta ma xo re planê xo verdayîsi roneno. Şarê ma heta cayê yeno pê ser û dijminanê xo vero vindeno û ïna re vano: Ti ya cayê ma yo, welatê ma yo. Ya şima do merdim bê û ma do piya ze birayan ti ya di roşê yan jî welatê ma ra bivîci. Lî

îna ze ma nêkerd. Di raya xirab ra nêvicê nê. Dima çend finê mileta ma û yên bînî pê di lec kerd û ma ra bol mierdimî kişiye yê. Lî fina jî mileta xo ver dabî. Dijmenan re no xo verdayîs bol zor yeno. Qandê ney jî daha bol yeno şarê ma ser û bol qetliamî keno ku milleta ma biterso fina behsê erd, ziwan, çiyo bîn û welatê xo nêker. È ma zanê ku mileta ma tersonek niyo. Neyrê vano "nê!" û xo ver dano. No sed serî vêşêriyo ku şarê ma qandê ku xo bişo dijmenan ra birey no ji verî ra vêşêri gûrwêno. Partiyanê xo virazeno. Ziwanê xo bi nûştişa mileto xo miyan di vila keno.

Lî dijmenê bol xayin û xirab ê. Bi camérdeya, bi ma nêşenê. Qandê ney jî ma qapenêne û şarê ma pê sero finenê. Çend teney herînenê û verdanê ê bînî sero. No sed serîn peyin di mileta ma bol merdim û xebat qandê nê xayinan ziyan û

vinî kerd. Xayintey derbey girdî da partîyan û şarî. Qandê neyo ku milet nêşeno bêro pê het, bi jev bo û dijmenan vero vindero. Mileta ma xo miyan di verî bol parce bîbî. Nika jî taynê ku biyê merdimê dewletî estê. Taynî jî bi eskeranen dewletî rî biyê jev û neverdanê şerê ku no çend seriyo qandê serkewtenê gamî girdî çekerdo vernî di şiro. Lî bi nina jî fina şarê ma êdo di vernî di bol çî xo dest fino. Qandê ku nika ze verî niyo. Nika mileta ma hewn ra werîsto. Partiyan xurt esto û qet nê vindeno. Biyo adir. Kotî di, kam no ser vero vindero, dano ciro. Qet ef nêker. Ü no jî çiyêno bol rin do. Heke şima ji mi ra perskerê û vacê cirê rin do. O wext jî ez o şimarê vaca; qandê ku tu bişê xo bireynê, lazim o ku verî ma xirabê xo, xo miyan ra vecê. O wext qewirnayış dijmenê bol rehet beno.

### XAÇEPİRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Ceperast:

1-Avakarê  
dewleta  
Eyûbiyan,  
Kurdê  
namîdar/  
Kinnivîsîna  
Osmiyûmê  
2-Piştigirî,  
alîkarî/  
Lêvegerandî  
n 3-Cihê ku  
endamên  
komik û  
komeleyan lê  
dicivin/ Lod,  
kom 4-  
Sembola

Sembola

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12



1-Teqwîm/ Sembola Baryûmê  
2-Ji afyonê çê dibe, madeyeke serxwesbûnê ye û gelek bi zerar e/ Ji mîran re tê gotin 3-Ava ku ji dev û poz dikise/ Reh, cihê ku xwîn tê digere 4-Xwendegaha bilind/ Celebekî hejmarê, cot 5-Li bajaran cihê firotana zerzewatan/ Kesê merd, camêr 6-Di ordiya Tirkan de leşkerên bê wesif/ Cephe 7-Cesûr, leheng/ Rojek 8-Di felsefê de raman/ Namûs 9-Iraq, milet 10-Pirtûkeke Dostoyevski ".....Karanîna" 11-Menzel 12-Sembola Selenyûmê


BERSIVÊN XAÇEPİRSA HEFTİYA ÇÜYİ  
Ceperast: 1-Zekiye Alkan 2-Evîn/ Trî/ Reh 3-Nd/ Team/ Ceza 4-Damizrah/ Nîr 5-Aloq/ În/ Dara 6-Zar/ Car 7-Elamet 8-Stû/ Çewt 9-Krem 10-Av/ Alarm  
Serejêr: 1-Zendawesta 2-Evdal/ Lt 3-Kî/ Mozaik 4-Întsqam/ Ra 5-Ez/ Reçel 6-Etarî/ Tema 7-Armanc 8-Lî/ Astim 9-C 10-Arena 11-Nezîr 12-Hara

**NEQUSK**  
Amadekar  
Aram Cem



Gelperestiya gelên serdest  
paşverûti, ya gelên bindest  
herdem pêşverûti ye.

Lenin



## Eman hewar yeknebin!

(2)

Li min biberin, me civîn bîr-ve kir. D. F. Muradê li der û dora xwe mîze kir, berçavîka xwe derxist, bi destê xwe porê xwe yê sipî û nerm ji ber çavêن xwe da alî. Rûyê wî yê glover wek heyva 14 rojî dici-risiya. Evdilzinar bi baldari-yeke mezin, hereketê D. F. Muradê taqîb dikirin. Bênav, bi çovekê û gelek bi lez û bez ber xwe dikoland. Mirov di-got qey li hin tiştîn pirr mu-hîm digere. Lî yên ku bênav nasdikin dizanin, ew ji civîn-mivînan aciz e. Dixwaze zâtir xelas be. Kes bi hebûna Kak Mulayim nedihisiya. Wekî hercar ew bêdengî, tenêbûn û xeyalân wî li hembêza hev bûn. Ji Baskê Sipî yek, ji ci-vatê parî dûr rûniştibû. Li ber xerîbî û belengaziya xwe diket. Ev mîrata şûşê, divê her-tim li ba wî bûya. Saetek ji bê wî fidare nedikir. Halbûku berî ku were vê Stokholma şewîfî çiqas xortekî çeleng û bi hêz bû. Lî niha? Ne diyar e, wê zarokê wî heta kengê derdê wî bikşinî? Ji ber vê yekê ji partiyeyeke biçûk hertim jê re lazim e.

D. F. Muradê bi peyva "ge-lî biran" dest bi axaftina xwe kir:

"Em niha partiyeyeke din çê dîkin. Navê vê avahiya me ya nû, wek Kak Mulayim ji dibêje, Yeknebin e. Çima Yeknebin? Belê, em bawer dîkin ku hem menfeetê me û

hem ji yê gelê me di Neyebûna me de ye. Gava gel yek nebe, ji me re karê şoresserî derdikeve ku em wan yek bikin. Îcar gava gel yek be em ci dîkin? Nizamî heval têdigîjin? Yanê, gelê me divê belav be. Ji bo ku em bikarîbin wî bikin yek, divê ew belav be. Niha gel parî yek bûye, tam di vir de, zirareke me ya mezin heye. Em heta dikarin, milet belav bikin, ji bo ku karê yekîti derkeve.

Ji aliye din ve, em perçeyek ji gelê Kurd in, gava ku em baş bin, kîyfa me li cih be endîrek gelê me ji fêde dibîne. Mesela em dikarin dê, bay, kal, zava, pismam, pis-xalî, zavayê meta xwe, qîza baltûza xwe, bacanaxê xwe, cîranekî xwe yê dewlemend bîn Swêd û ji wan re musadeya rûniştinê bistîn. Ma ew giş ne gel in? Heger ew negel bin, baş e, bi rastî ji gel kî ye? Evdilzinar bersiva serokê xwe dide û dibêje: "Em divê dev ji wan çewtiyê xwe yê berê berdin. Ew ehmeqi-ya berê bes e. Nizamî fedekarî ji bo welat, fedekarî ji bo gel, ev gotin ji min re êdî fasafiso ne. Gotineke Tîrkan heye dibêje: "Önce can sonra canan."

D. F. Murad bi işaretâ destê xwe dengê Evdilzinar dibirre û dom dike:

Divê gelê me ji, me fam bi-

ke. Çawa? Belê, min 12-13 sal serokatî kiriye. Dibe ku wek serokatiya xelkê nebe ji, lî, keyfa min jê re dihat. Ne xirab bû! Ez înakar nakim, ku ez pirr xweş jiya me. Ji Yaser Erafat bigrin heta Mam Celal, min bi gelekan re hevalî kiriye. Hevalîn ku bawer nakin ez dikarim fotografan nîşanê wan bidim. Ji we hinekan dîtiye. (Evdilzinar serê xwe dihe-jîne) Baş e, ez niha serokatî nekim ka ci bikim?

Ji der û dorê me hin dostan, zarok-marokan ji, ji min re gotin: Dev ji serokatiyê berde em nikarin qehrê xelkê bikşî-nin! Hûn hemû dizanin min ji bi ya wan kir, ez çûm û min li jora Swêdê di nav qesayê de, restoran tek vekir. Xwedê heye, karê min ji xirab nîn e. Lî, halê serokatiyê başqe ye. Karê te tune ye, li ber kasê bisekine, restoran tek veke û big-re. Axir bi tenê ev kar û pere nema min tatmîn dike. Min bawer kir ku ez bê serokatî û siyasetê nema fidare dikim. Ez dizanîm derdê me gişan ji ey-nî ye. Gelo kî ji we bê siyaset dikare bijî? Evdilzinar dîsa xwe nagre û dibêje: "Herçî ez wek Lawîkê Naxîrvanê di ko-vara xwe de, dijminê xelkê nedim û xwe rehet nekim, qet sebra min nayê. Di hejmara dawî de min dîsa mala wan şewitandibû." Bênav çova xwe ji destê xwe davêje. Tu dibêjî qey bi saetan e, li benda

vê gavê ye, li Evdilzinar me ji we re pîroz be! Ez bamer im di nav van munâşeyen dijwar de, we tiştekî ji bîr ve kir. Heger heval ji mu-nasîb bibînin ez dixwazim bêjim, ji partiya me re program û destûrek lazım e. Li ba-min hem destûr û hem ji program peyda dîbin. Çaxa ku ez li Dîmeşq bûm, min ji bo rojekî wiha gelek civan-dibû."

Kenekî nerm û ciwan rûyê D. F. Murad ronî dike. D. F. Murad berê xwe dide Kak Mulayim û dibêje: "Kak Mulayim, tu ji bo tiştîn wilo xwe hîç neêşne! Ji ber ku ne muhîm bû, min behs nekir. Em bi tenê navan diuguherîn û dû re xelas!"

Xuya ye, beşî resmî yê ci-vînî diqede. Evdilzinar û D. F. Murad di nav xwe de qise dîkin. Baskê Sipî bi hevalî xwe re li ser tiştek munâşe dike. Kak Mulayim destê xwe kir bêrika pantorê xwe û di nava daristanê de winda bû. Bênav, di ber min re derbas bû û bi xwe re qise dikir, tiştîn ku min ji wî fam kir, bi tenê çend gotin bûn, Bênavê wiha dijgot: "Bênavo, lawê ni-zanîm ci, ev ci karê te ye? Ma tu q... deveyan boyax bikî ji vî ne çêtir e?"

J. Diyarbekirî

## TÎR

Musa Anter



## Birçibûn

E vî pirs ji Kurdan re ne pirseke xerîb e. Ji ber ku xelkê em tim birçî hiştine, lê pîrsa min li vir ne li ser birçibûna zik e. Ez niha dinerim û isal 60 sal ji, min ji xwe dîtibû ku xort û zarokên Kurdan birçiyê ilm in birçiyêzanîne. Ne hewce ye mirov bêje, insanîn têr mirov nikare ikramê ji wan re bike. Lî, yê birçî iş rehet dike. Pîrsa Elani Pêyiyan heye. Dibê: "Birçibûn aşçiyekî baş e, yanî ku insan birçî be çavê wî li xwarinî ye. Ilim ji û zanebûn ji wiha ye. Xelkê em Kurd birçiyê xwarinî ji kirin û yêzanîn ji.

Min li Edenê lîse dixwend, hevalê min ne ehmeq bûn, lê giş zarokên dewlemendan bûn, ez feqîrê herdû xalan bûm ilm ji û zik ji. Min deh carî ji wan bêhtir dixwend û ez dixebeitim. Ne ku ez ji wan bi aqîltir bûm, lê ez birçiyê ilm bûm. Mêrika ne muhacîte tiştekî bûn. Bav û kalên wan ên diz, hemû tiş ji wan re hazir kiribûn. Lî yê min tiştekî tune bû. Lî, ne ku ez ji bi diziyê di nav wan kevîm, min divibû ku ez zanebûn di nav mîletê xwe xim. Min zanibû ku bi hezaran xorten Kurd yê wek min birçiyêzanîne hene.

Ez niha dinerim bi kêt û eşq ku xorten Kurdan bi ser birçibûna xwe ve vebûne. Ez ne bi pesindan dibêjim, lê ez dinerim ku li çiqas cihê xwendina xortan heyé xorten Kurd li pêsiyê ne. Çawa xwarinék bê ber mirovan, pêşî yê birçî dest davêjîne niha ilim ji ji xorten Kurdan re wiha ye. Şairekî Tîrkan ku eslê wî Arnawut e heye. Navê wî Tevfik Fikret e. Navê lawê wî ji Haluk e. Kitêbek nivîsiye navê wê "Haluk'un Defteri" ye, angô deftera Haluk e. Li İstenbolê têkiliya Tevfik Fikret û Amerîkiyan bi hev re hebû. Lawê xwe Haluk şand Amerîka tehsîla Elektirikê. Li wir pîsek wî ya xweş heye. Bi Tîrki ye, lê eme bi kurdi bêjîn: Dibê lawo Haluk bi qefla ji me re şeqwê werîn, ketîna me ji reşayê ye. Ez vê pîrsî ji xorten Kurdan re dibêjim: Xortino! Hûn birçiyen zanîne ne, vê kêmasiya xwe qebûl bikin û bi pê ve herin. Heta ku hûn nebin zana û wek mesela Tevfik Fikret û lawê wî, hûn bi qefla û himbêzan şeqwê neyînîn pêsiyâ mîletê Kurd, eme bikevin û eme tim li erde bin.

vê gavê ye, li Evdilzinar me ji we re pîroz be! Ez bamer im di nav van munâşeyen dijwar de, we tiştekî ji bîr ve kir. Heger heval ji mu-nasîb bibînin ez dixwazim bêjim, ji partiya me re program û destûrek lazım e. Li ba-min hem destûr û hem ji program peyda dîbin. Çaxa ku ez li Dîmeşq bûm, min ji bo rojekî wiha gelek civan-dibû."

Kenekî nerm û ciwan rûyê D. F. Murad ronî dike. D. F. Murad berê xwe dide Kak Mulayim û dibêje: "Kak Mulayim, tu ji bo tiştîn wilo xwe hîç neêşne! Ji ber ku ne muhîm bû, min behs nekir. Em bi tenê navan diuguherîn û dû re xelas!"

Xuya ye, beşî resmî yê ci-vînî diqede. Evdilzinar û D. F. Murad di nav xwe de qise dîkin. Baskê Sipî bi hevalî xwe re li ser tiştek munâşe dike. Kak Mulayim destê xwe kir bêrika pantorê xwe û di nava daristanê de winda bû. Bênav, di ber min re derbas bû û bi xwe re qise dikir, tiştîn ku min ji wî fam kir, bi tenê çend gotin bûn, Bênavê wiha dijgot: "Bênavo, lawê ni-zanîm ci, ev ci karê te ye? Ma tu q... deveyan boyax bikî ji vî ne çêtir e?"

J. Diyarbekirî

# 69 sal berê Peymana Lozanê û qedera gelê Kurd

● Lozan bû bingeha perçekirina welatê me. Rewşa me ya ji doh heta iro û qedera me bi lîstikên Lozanê ve pirr nêzîk girêdayî ye. Ji bo vê jî divê em Kurd Lozanê dîsa bînin bîra xwe. Ji ber ku rewşa gelê Kurd a iro, têkîlî û nakokiyêne dewletê dagîrker û hêzên emperyalîst ji bo gelê Kurd tekrara Lozanênu ye.

● Lîstikên Dewletê emperyalîst û dagîrkeran li Başûrê Kurdistan pirr dişibin lîstikên Sevr û Lozanê. Heta mirov dikare bibêje Kurdistan iro bi van lîstikan bûye pênc (5) perçe. Ji ber ku Kerkuk jî ji Kurdistana Başûr hatiye cuda kirin. Heke Kurd bi xwe peymanen ku qedera gelê me tayin dike imze neke û bihêle ku dewletê emperyalîst û dagîrker ji bo me berpirsiyariye bike, dê jiyan û rewşa gelê me her tim wiha bi kuştin, koçberî, qirkirin, zîndan û lêdanê ve dagîrî be.

## M. Ali Tüysüz

Peymana Lozanê ku di 24'ê Tîrmeha 1923 an de hate imze kirin, di van rojan de 69 salen xwe tije dike. Ev peyman ji bo gelê Kurd peymaneke xerab û girêng e. Ji ber ku Lozan bû bingeha perçekirina welatê me. Rewşa me ya ji do heta iro û qedera me bi lîstikên Lozanê ve pirr nêzîk girêdayî ye. Ji bo vê jî divê em Kurd Lozanê dîsa bînin bîra xwe. Ji ber ku rewşa gelê Kurd a iro, têkîlî û nakokiyêne dewletê dagîrker û hêzên emperyalîst ji bo gelê Kurd tekrara Lozanênu ye. Berî ku em behsa Lozanê bikin divê çend gotin li ser bûyerên beriya Lozanê werin kirin.

Serê cîhanê yê yekemîn bi Mutarekeya Mondrosê di 30-31'ê Cotmeha 1918 an de gihîste dawî. Pişti vê Peymane û Peymana (23'ê Tîrmeha 1919) û Sivasê

Lozanê 1923 û Peymana Brusel, perçen welatê me yên ku iro di nav sînorêne Sûriyê û Iraqê de ne, ji destê İmparatoriya Osmaniyan û dûre, ji destê Komara Tîrkiye derket. Ji ber ku Fransa û Brîtanya ev perçe di şerê cîhanê yê yekemîn de îşxal kiribûn. Heta çend bajar ji Bakurê Kurdistan jî di destê wan de bûn. Pişti şer, Kurd demeke bi hêviya welatekî serbixwe dijîn. Welatparêz li Kahta (Adiyaman) civîneke amade dikin, li vir serxwebûna welêt muneqeşe dikin û ji bo rabûnekê haziriyan dikin. (1) Şêx Mahmut Berzencî jî, di van salan de şerê welêt dikir û wî xwe di 1'ê Mijdarê de li Suleymaniye serlesker (komutan) ilan kiribûn. (2) Di van salan de rewşa Osmaniyan, ji ber windakirina şer, xerab bû û M. Kemal jî li Erzorûm (23'ê Tîrmeha 1919) û Sivasê

## LOZAN: "PEYMANA ÇIRANDINA PROJEYA KURDISTAN"

Li aliye din, M. Kemal hêdî hêdî bi alîkariya Kurdish yekîtiyekî li dij mutefikan dişirine û bi meclisa xwe ku di

(4'ê Îlonê 1919) hîn di Kongran de li alîkar û hevalbendan digeriya, yanê ew hîn nebûbû xwediye hêzên xurt.

### PEYMANA SEVRÊ

Albay Bill ê Brîtaniyê ku li Helebê bû, hazırlıyan Kurdistan yên ji bo serxwebûnê, bi sozên girêng disekinîne. Li gor wî, dê dewletê mutefik daxwazân Kurdistan bînin cih. (3) Armanç, di peymana Sevrê de çareserkirina pîrsê ye. Sevr di 10'ê Tebaxê 1920 an de imze dibe. Di amade û imzekirina vê peymanêde, delegasyona M. Kemal tune bû. Ew li dij vê peymanê bûn. Dewleta Osmaniyan delegasyona xwe şandibûn. Bendêne (madeyên) 62, 63 û 64 an ku Osmaniyan û dewletê ku di şer de bi ser ketibûn, imze kîribûn, li ser çareserkirina pîrsa Kurdistan bû. Di van bendan de bi kurtasî azadî û serxwebûna Kurd û Kurdistanê tê parastin û dewleta Osmaniyan jî van qebûl dike. Di benda 64 an de bi kurtahî wiha tê gotin. "Heke gelê Kurd bixwaze ji Osmaniyan veqete û xwestina serxwebûnê bîne û heke Koma Miletan jî vê qebûl bike, Osmanî mecbûr in ku vê qebûl bikin û ji peymanê reitaet bikin. (4)

23'ê Nîsanê 1920 an de ava bûbû, li dijî vê peymanê derdikeve, wê qebûl nake.

Sovyet jî li dij vê peymanê ye û dostê hikûmeta Enqere ye Kurd jî zêde guh nedane Peymana Sevrê. Heta hînek ji wan ji temsilciyê Kurdish ê Sevrê, ji Şerîf Paşa re telgraf bi rî dikin û dixwazin ew dest ji peymanê berde. (5). Ji ber ku Kurdish îcar hêvî ji M. Kemal dikirin. Li gor wan, heke M. Kemal bi serkeve û talûka Ermeniyan ji holê rabe, dê M. Kemal heq û daxwazân gele Kurd bîne cih. M. Kemal jî ev soz dabû Kurdistan. Hînek Kurd jî, li dijî Kurdistanê serbixwe bûn. Heta yên ku ne dixwestin imparatoriya Osmaniyan belabe, di pirranî de bûn.

M. Kemal bi serket. Meclisa xwe di 1920 an de vekir. Rûm li Izmirê avêtine Egê û qirkirin, İstanbul ji mutefikan filitand. Berî ku Peymana sevrê di jiyanê keve divê dorbihata Kurdistan. Çend meh berê ku avakirina Komara Tîrkiyê (29 Cotmeh, 1923) ilan bike, Peymana Lozan di 24'ê Tîrmeha 1923 an de hat imze kirin. Sevr, di şerê cîhanê yê yekemîn de, bi serketina hêzên mutefik (Brîtanyê, Frense, Amerika), Lozan bi avakirina dewleta Tîr (bi serketina M. Kemal) tê imze kirin. Y. Küçük jî bo van herdu peymana wiha dibêje: "Sevr proja dewleta Kurd e, Lozan jî cirandina proja dewleta Kurd e." (6)

**Lozan:** Pişti belavbûna imparatoriya Osmaniyan, M. Kemal di şerê li dijî Yunan, Frense û Brîtanyê de bi serket. Axa Tîrkiyê bi pirranî ji van dewletan azad bû. Lê perçeyen Kurdistan Sûriyê û Iraqê di dest Frense û Britaniyê de man. M. Kemal xwest serkeftina xwe di Lozanê de bi besdarbûna delegasyona xwe ji bo qada (alan) navneteweyî îspat bike. Bi vî awayî, wê bikaribuya dewleta Tîr a nû bida nasandin û Koma Miletan jî wê hikûmeta Enqere qebûl bikira. Dîsa pîrsa Kurdistan li ser masa emeliyatê bû. Di masê de Frense û Britaniyê şerê Anadolûye winda kiribûn. Tîr li vî aliye xurt bûn.

Van herdu dewlatan (Frense û Britaniyê), di salen şer de hêzên xwe bi pirranî winda kiribûn. Sovyet jî li dijî Rojava piştgiriya Tîrkiyê dikir. Bi gotinek din, şertîn navneteweyî yên berbihev (elverişli), li hundir serketina şerê neteweyî di bazara pey-

manê de ji bo Tîrkan awanta-jeke girêng bû. (7)

### ENCAMA PEYMANA LOZANÊ

Wezîrê Karêderve yê Britaniyê di sala Lozanê de Lord Curzon bû. Serokê heyeta Tîr Ismet İnönü bû. Celal Bayar jî, di heyetê de hebû. Heyetêne dewletê din jî hemû besar bûn. Civîn û Konferansêne ku haziriya imzekirina Lozanê dikirin nêzîkî salekê domkirin. Peyman, di 24'ê Tîrmeha 1923 an de hat imze kirin. Di vê peymanê de, welatê Kurdish, di navbera Britaniyê û Tîrkan de, ji bo halkirina pîrsa Musul û petrola wê, ji bo bikaranîne bû wesîteyek. Li ser sînoran li hevhatin çebû. Lê pîrsa Musulê pişti çend salen din (1926) hal bû. (8) Musul, dema ku Mutareka Mondros di 30-31'ê Cotmeha ya 1918 an de hatibû imze kirin, di destê Britaniyê de bû. Britaniyê Musul pişti vê peymanê îşxal kiribû. Ji bo vê jî, li gor Tîrkan Musul a Tîrkiyê bû. Lê ev pîrs jî hal bû. Dewletê emperyalîst, Kurdistan perçe kirin, bendê Sevrê ku, çareserkirina pîrsa Kurdish kiribû program, hatin istismar kirin û firotin. Edî ew bendê ku ji bo dewleta Kurdish hatibûn rîzkirin, ji aliye dewletê emperyalîst ve ne dihatin parastin. Sînoran ku gelê Kurd perçe dikin, hatin tespît kirin.

Heke mirov li rewşa pişti şerê Xalîcê/ Kuveytê û gelê Kurdish mîze ke, bîbe nebe, Sevr û Lozan bi bîra mirovan tê. Lîstikên Dewletê emperyalîst û dagîrkeran li Başûrê Kurdistan pirr dişibin lîstikên Sevr û Lozanê. Heta mirov dikare bibêje Kurdistan iro bi van lîstikan bûye pênc (5) perçe. Ji ber ku Kerkuk jî ji Kurdistana Başûr hatiye cuda kirin. Heke Kurd bi xwe peymanen ku qedera gelê me tayin dike imze neke û bihêle ku dewletê emperyalîst û dagîrker ji bo me berpirsiyariye bike, dê jiyan û rewşa gelê me her tim wiha bi kuştin, koçberî, qirkirin, zîndan û lêdanê ve dagîrî be.

**Cavkanî**  
1- G. Sasuni, Kurt Ulusal Hareketleri, rûpel.162

2- Ş. X. Mihoyan, İki Dünya Savaşı Arasında Irak'ta Kurt Sorunu, r.15

3- G. Sasuni, r. 162

4- G. Sasuni, r. 166

5- Deng, Hejmar 13, 1991, r. 31

6- Y. Küçük, Kurtler Üzerine Tezler, r. 18

7- K. D. Y. Manifesto, r. 169

8- K. D. Y. Manifesto, r. 170



Li Lozanê serokê heyeta Tîr Ismet İnönü (İsmetî ker) bû.

Ji edebiyata klasîk: Willîam Shakespeare

# Cîhan tev de sahneyek e

- Shakespeare torevanekî gelek xurt bû, lê tevî vê yekê mirovekî alelade û terbiye nedîfî bû. Ferq û cudahiya kûr a navbera aleladehî û serfiraziya berhemên wî, bûne sebebê gotinênu ku dibêjin berhemên wî ne aydê wî ne, berhemên wî ji hêla Bacon, Marlowe û hinek nivîskarênu din ve hatine nivîsin.
- Shakespeare di afirandina soneyênu herf saxlem û jîndar de bi serketiye. Ji bo ku afirandêriya Shakespeare ji her aliyan xwe ve bê naskirin û fam kirin, divê ku soneyênu wî bi awayekî hûr û kûr bênu xwendin, vekolîn û nirxandin.

## Çilkezî Keskin

Sal 1556, Shakespeare li Ingilîstanê, li bajarokê Stratford-Upon Avon ji diya xwe dibe. Tê zanînu ku bavê wî pêşî çermvanî dike, hîrî dikirre û difroşê, dûre dikeve nav xebatênu belediyê û di rîveberiya belediyê de dibe yek ji rîvebirênu xwedî gotin. Bes li ser jiyana Shakespeare pirri tişt nayênu zanînu.

Dîroknasên wêjeyê (edebiyatê) êdî zehf li gor iştîmalan di derheqê jiyana wî de malûmat didin. Bi iştîmaleke xurt Shakespeare, li Stratfordê di xwendegeheke baş de dibistana navînu xwendiyê. Li vê dibistanê zimanê latinî fîr dibe lê naçe unîversitê.

Di sala 1582 an de dizewice. Pişî vê zewacê 7-8 salê wî kes nizane bi ci awayê derbas dibe. Sala 1592'yan li Londrayê, di muhîtî tiyatroyê de navê wi tê bihîstîn.

William Shakespeare hem nivîskarê lîstikêni tiyatroyê, hem ji helbestvan bû. Em berhemên wî giş dikarin di du beşan de kom bikin: Helbest û lîstikêni tiyatroyê.

Di nav berhemên wî yên helbest de, yên herf navdar Sone, Venus, Adonis û Revandina Lucretia ye. Di nav lîstikêni tiyatro de ji yên herf girîng Mîr Lear, Hamlet, Keçika bêar, Romeo û Juliet, Jules Ceaser, Timonê Atinî, Othello, Makbet, Henry ye ji ew e ku mirov dikare di IV Qerebalixa Ziwa û soneyênu wî de jiyana wî ya

Kewna şeveke havînê ne. Diyar e ku William Shakespeare berhemên nivîskarênu biyanî wek Petrarch (1304-1374), Pierre de Ronsard (1524-1584) Torquato Tasso (1544-1595) û soneyênu şâfrîn Ingilîz wek Sir Philippe Sidney (1543-1586) û Samuel Daniel (1562-1619) xwendine û di bin bandora (tesîra) wan de maye.

Di helbesten Shakespeare de bi pirranî dengenî lîrîk (bi aheng) xwe didin xuya kirin. Helbesten wî heste û dilger-miyênu xurt, dilşewat û dilgesiyênu gurrîn ziman. Dema dibêjin "Shakespeare" di nav berhemên wî de pêşî soneyênu wî têna bîra mirov. Hetta, em dikarin bêjînu ku ew bi saya soneyênu xwe ew çend nav û deng da.

Sonet, cara pêşî di Ronesansa İtalî de derdikevin holê. Beriya Shakespeare, Sone ji teref çend şâfrîn Ingilîz ve ji hatine nivîsin û pêş xistin. Bes, bi saya Shakespeare sone gihîştine sewiya xwe ya bilind û bûne navgînênu xurt ên lîrîzmê.

Shakespeare di afirandina soneyênu herf saxlem û jîndar de bi serketiye. Ji bo ku afirandêriya Shakespeare ji her aliyan xwe ve bê naskirin û fam kirin, divê ku soneyênu wî bi awayekî hûr û kûr bênu xwendin, vekolîn û nirxandin.

Di soneyênu wî de taybetiyeke din a balkêş (interesant)

şexsi û quncikênu tarî yên dinya wî ya hundirîn bibîne.

Bi iştîmaleke mezin, soneyênu wî di navbera salên 1588-1609 de hatin nivîsin.

Shakespeare, rexneyênu herf dijwar, di sala 1592 an de, ji ber xebatênu xwe yên li Londra distîne û dîsa hînge dostênu ji dil û can ji xwe re çedike.

Shakespeare armâanca tiyatroyê bi gotinênu "Neynika xwezayê" yên Hamlet ifade kiriye û her cure (çesit) hest û lihevketinênu xwezaya mirovan bi peyv û sîmgeyênu ku di hişê mirov de cih dikolin, daye nîşandan. Di demeke ku raman û fîkrênu nû derdikevin ser rûyê avê û bi raman, dîtin û helwesten Kevin re li hev tesîra dikin de Shakespeare berhemên xwe

diasfirine. Di wê demê de, raman û sazgehênu bermayıf, serdemâ navîn (Ortaçağ) têrrexne û pîrsiyarî kirin. Sîste-ma aborî û civakî bi bandorî û tesîra kapîtalîzmê dilerize û dişewise.

Bi tesîra kapîtalîzmê, nema kes bi pîrsa "mirov divê ci bikin?" re eleqedar bû. Di şuna vê pîrsê de pîrseke nû "mirov ci dikin" cih girt û bi girîngî li ser hate rawestin.

Di vê demê de, teoriya siyaseta Machiavelli û ceribandinênu Montaigne bi ingilîzî hatine wergerandin û van berhemên Ingilîz di bin tesîra xwe de hiştin. Shakespeare ji bi kurahî di bin tesîra van berhemên wergerandî de dimîne.

Shakespeare torevanekî gelek xurt bû, lê tevî vê yekê

mirovekî alelade û terbiye nedîfî bû. Ferq û cudahiya kûr a navbera aleladehî û serfiraziya berhemên wî, bûne sebebê gotinênu ku dibêjin berhemên wî ne aydê wî ne, berhemên wî ji hêla Bacon, Marlowe û hinek nivîskarênu din ve hatine nivîsin.

Ji ber ku ji lîstikênu wî yên ku bi destênu wî hatine nivîsin, yek bi tenê ji negîştine ta fro, suphe û gumanênu di derheqê nivîskariya Shakespeare de zîdetir kiriye û ewreke tarî xistiye ser neynika wî ya ku jiyanê ronahî dike.

Shakespeare di sala 1664 an de li Londra mir, lê gengeşî û munaqeşen li ser nivîskariya Shakespeare fro ji dom dikin.



Shakespeare û imzeyâ wî

31/1/1992  
3

# PÊNÛS

Amed Tigrîs

## Radyoyên tirkî yên li derve

**W**ek ku tê zanîn li dervayê Tirkîye gelek stasyonê radyoyan hene ku bi tirkî weşanên rojane û heftane dîkin. Pirranî gira niya van radyoyan têkiliyên wan bi dewleta Tirk re tune ne. Ev, bi welatên ku lê weşan dîkin ve girêdayî ne. Ew welat bi xwe wan radyoyan finanse û idare dîkin. Li gor politika û berjewendiyên dewletên xwe, weşan bi tirkî û gelek zimanên din dîkin. Prensibên weşanên wan jî helbet li gor qanûn û dîtinên demokrasiya wan dewletan in.

Ji van stasyonê radyo yên bi tirkî li Ingîltiranê BBC, li Almanyayê Radyoya Kôlnê, li Holandê Radyoya Holandê, li Amerika Dengê Amerika, Li Swêdê Merhaba û hwd. in. Dewleten Ewrûpî, her yek ji bo her beş û zimanê biyanî butçeyên wan ên taybetî û serbixwe hene. Ji bo her zimanî bi dehan kes kar dîkin. Ew wek teknîsyen, nûcêgihan, spiker, karmend (memûr) û karker destmiz û maşen xwe ji van digirin. Di van stasyonê radyoyan de, ji bo beşen zimanê tirkî jî rewş herwiha ye. Ew kesen ku di beşen zimanê tirkî de kar dîkin tu têkiliyên (eleqeyên) wan û dewleta Tirkîye bi hevdû re tune ne. Yek tiştek heye, ku ew kes bi tenê Tirk in. Lê wek karker û karmendên wan dewletan kar dîkin. Li gor politika weşanê wan dewletan, bi tirkî jî divê weşan bikin. Nûcê û komenterên xwe bidin. Ew beş an kesen ku derbi Kevin derê prensib û çarçovêkên politika weşanên wan dewleten ku lê weşan dîkin, wê demê sazgehê radyo û TV yên wan dewletan li dij wan beş û kesan tedbiran digirin. Mudaxele dîkin.

Radyoyênu me navên wan li jor dan, ew li Ewrûpa bi tirkî weşan dîkin, di van çend salen dawî de, carna wek dengê Tirkîye weşan dîkin. Yekê ku nizanibe dibêje qey ev dengê Tirkîye ne. An jî radyoyênu Tirkîye ne, ku li der propaganda dewleta Tirk dîkin. Ew Tirkên ku di van radyoyan de kar dîkin, pirraniya wan mirovên dewleta Tirk in. Her çiqas ew bi salan li Ewrûpa bimîn, bixwîn û kar bikin jî, disa serê wan carek bi ideolojiya Kemalist hatiye şüştin. Ew li Ewrûpa barkêş û bargiranên ideolojiya Kemalist in. Xwediyê dewleta xwe ya nîjadperest in. Ew nema nûcêyên Kurdistanê didin, ne wek radyoya wî welatê ku lê dijîn, lê, wek radyoyênu Tirk ên li Tirkîye didin. Serçavîyên nûcêyên wan Waliyê Kolonyalîst (Super Vali) didin. Dema Timê Taybetî, leşker, polis û kontra Kurdên sivil qetil dîkin, wek serok û berpirsiyaren dewleta Tirk wan qetlan dîkin ser gerîla û disa wek dewletê PKK û ARGK wek terorist an jî parvekar (bölgü) nîşan didin. Paşê dema bûyer eşkera dîbin, ku bi rastî wan qetfaman hêzên dewletê çekiriye, êdi careke din rastiyê nawaşînin. Nabêjin ku ew nûcêya me çewt bû. Vedişerîn. Disa wek radyoyênu Tirkîye ji herêma Kurdistanê re dibêjin "Başûrê-Rojhilat" (Güneydoğu) û hwd. Bi kurtasî ew kesen ku di van radyoyan de dixebeitin, wan radyoyan wek radyoyênu Tirkîye li dij Kurdistan bi kar tînin. Mînak gelek in, ku mirov bide.

Dîvê rîxistin, dezgeh û kesen Kurdish ên welatparêz li hember van weşanen hişyar bin. Weşanen wan bigirin kasetan. Û bi dokumen-tan bala berpirsiyaren giştîyên van stasyonê radyoyan bîşînîn, ku beşen tirkî politika Tirkîye dîmeşîn. Xwepêşandanen gîrsî li ba xaniyêwan pêk bînîn. Bala dewleten Ewrûpî bîşînîn. Ji welat jî, ji wan radyoyan re nameyên protestoyî bîşînîn û derewên wan derxin rastê.



Pirtûka dersê: Dîroka Kurd û Kurdistanê



## Dîroka Kurd û Kurdistanê

Dîroka Kurd û Kurdistanê ji aliye Amed Tigrîs û Aso Germiyanî ve hatiye nîvsandin. Berf çapê, pirtûk ji aliye komek mamosteyen Kurd ve, di çav de hatiye derbas kirin. Dîroka Kurd û Kurdistanê pirtûkeke dersê ye û di dibistanen Swêdê de, ji bo dersen kurdî, di polen (sinifên) 7, 8, 9 û liseyê de tê bi kar anîn.

Pirtûk ji çar beşan pêk tê. Beşa yekemîn "Berf zayînê Kurd", beşa duymîn "Pişî Zayînê Kurd", beşa sîyemîn "Kurdistan di navbera her du Şerîn Cîhanê de" û beşa çaremîn jî "Pişî Şerîn Cîhanê yê

## Di çanda me ya kevin de sixêf, filîtentî û leqeb

● Di nav kenokan de jî, sixêf û filîtentî, pîr cih digirin. Ku mirov, filîtentî û sixêfan ji nav kenokan Kurdistan derînê, li gor dîtina min wê ev kenok gelek qels bibin, ji ber ku kenokan me, yê bê sixêf gelek kêm in.

### Medenî Ayhan

Berî niha bi çend salan, cihê sixêfan û filîtentiyê (müstehcenlik) bi pirranî xuya dikir. Gava ku mirov bi riyeke ve diçû, sixêf zarakan weke ba di ber guhê mirov de derbas dibûn. Ji xwe, di pevçûnen pîrekan û zilaman de jî, sixêf serê rimê bûn.

Lê tişte ku bala me dikşîne, di nava kenokan (fikra) me de jî, gelek caran, sixêf û filîtent derbas dîbin. Mirovên me bi riya henekan carna wi-lo jî, bi navê heywanan banî hev dîkin, dibêjin: "Kûçik, Kero, Bergilo, Hirço... û hwd."

Di nav kenokan de jî, sixêf û filîtentî, pîr cih digirin. Ku mirov, filîtentî û sixêfan ji nav kenokan Kurdistan derînê, li gor dîtina min wê ev kenok gelek qels bibin, ji ber ku kenokan me, yê bê sixêf gelek kêm in.

Di civatan de jî, leqeb gelek têni bi kar anîn û ev pirranî, bi sixêf, navê heywanan an jî filîtentî ne wek "Seydayê q...., sertûjo, dîk, jojî, keftaro, rovî.... û hwd.

Ji bo mînak, ezê ji we re kenokekî binivîsim. Rojekî çar pênc xort diçin qehweye-kî. Heta êvarê bi "keramaça" dileyîzin. Saet dîbe 12'ye şevê. Pere bi yekî ji wan re jî tune ye, xwediyê qehwê tê, ku perê xwe bistîne, dibêje:

-Dîk! Ka perê vexwarinên xwe bidin, emê qehwê bigirin.

-Ji jojî bistîne!  
-Jojî ka pere.

-Ji keftaro bistîne!

-Keftaro ka pere

-Ji rovî bistîne!

(Xwediyê qehwê destê xwe davêje berîka xwe û derî digire.)

-Haydê yabo, we 8 çay vêxwaribûn, a ji we re heqê 8 çayan; lê, ez dexîlê we me cardin neyên vê derê, ev ne beşçeya heywanetan e!..

Di stran û dîlokên me de jî, carna tişten filîtentî hene. Li dawetan dema ku mitrib li daholê dixin, xwe davêjin rastê û dibê: "Lê, lê, lê wa Emîne, memkê te sor sipîne", "çavê keçikê li yaşinê, çavê mele li doxînê." "Ez ne bi xema pera me, derdê min ramûsan e." û hwd...

Van stran û dîlokan pîrtir mitrib li dawetan digotin. Carma jî hunermendên me yê herêmî digotin. Ev hunermend, heta demeke nêzik gelek bûn. Miradko, Xidirko, Hiseynko hin ji van hunermendan bûn.

Gund û bajareñ welatê me, paytexten sixêf û tişten filîtentî ne. Sitîlîlê di van tiştan de, li welatê me serî dikşîne. Ev tişten ku li Stîlîlê têni gotin, li cihekî din bêni gotin, dê xwîn birije.

Li gor baweriya min, di çandâ me de sebebê cih standina sixêf leqeb û tişten filîtentî ew bû ku, di civatên me de têkiliyên pîrek û zilaman kêm bûn, pîrek di civînen zilaman de cih nedigirtin, lew-re jî, di van civînan de serî sohbetê zayênd (cinsellik) dîkişand û bi vî awayî ev tiş bi pêş de çûn.

Wekî din, ev tiş bi sazûman û bîrdojiyê re têkilî girtiye. Bîrdoji û sazûmanen ku têni, çanda xwe jî, bi xwe re tînîn û radixin. Edî li welatê me çanda feodal cihê xwe dide çanda nû, çanda têkoşîna şoresê.

Ji hunermendên me yê herêmî Hiseynko, berê bi têkoşînê re têkilî danetanî. Stranen bi sixêf û filîtentî di-got. Hiseynkê berê di straneke xwe di digot: "Jî min re dibê Hiseynko Omerî / Min li kitêbê nêri / Memkê nofa derman in."

Lê pişti ku li welatê me têkoşîna şoresê dest pêkir, ev hunermend û hunêra wan rûmeta xwe winda kir. Dawet jî, hew weke berê têni çekirin. Yênu ku hunera xwe didomîn jî, van tişten bi sixêf û filîtentî nabêjin, hunera xwe gihadin têkoşîna şoresê. Huner li ser pêdiviyê gel çedîbin. Hunermendên ku xwe nû nekin û li talî bimîn, kes edî guh nade wan.

Ez dibêjim qey, Hiseynko jî, hinekî ber bi têkoşînê hat û wî jî dît ku gel, tişten têkoşînî û şoresî dixwaze, qaseta xwe ya dawî wiha dagirt: "Cendirme, cendirme, siktir bib ji welatê me."

Hingî ku di hunera wî de sixêf û tişten filîtentî hebûn, çiqas berê xwe da têkoşînê jî, xwe bi temamî ji van tiştan qut nekir. Kî zane? Ku "siktir bib" jî bi qestî gotiye.

Ev hemû li aliyekî, têkoşîna şoresê bi xwe re bîrdoji, bîrdoji jî, bi xwe re çandeke nû tîne.

Ev çanda nû, li ser çanda kevin şîn dîbe. Lê gelek tişten çanda kevin, wek pelê daran-hildiweşin.

Di dawiya pirtûkê de ferhengoka kurdî, swêdî û tirkî heye. Pirtûk bi alîkariya Enstituya Dewletê ya metaryalîn Hînkirinê ya Swêdê hatiye çap kirin. Pirtûkeke resmî ye. Pirtûk heta niha sê caran hatiye çap kirin. Çapa yekemîn di Çileya Pêşîn a 1990 an de, li Stockholmê, ji aliye weşanxana APEC ve hat çap kirin. Di Adara 1991 an de, weşanxana Koral li İstenbolê bê ïzin ji nû ve çap kir. Ev çap gelek bê qelte ye. Di sala 1991 an de, ji dîsa APEC û li Stockholmê Dîroka Kurd û Kurdistanê bi tîpên erebî û bi zaravayê Soranî çap kir. Pirtûk 86 rûpel e. Bergê pêşîn (ön kapak) peykerê (heykelê) Kawayê Hesinker li ser e û berg rengin e.

# Pertew Begê Hekarî (Sah Pирто)

**Pertew Beg ji mala mîrên Hekkariye ye.** Di dawiya sedsala 18 an de û di serê sedsala 19 an de jiyyaye. Helbesten xwe di dîwana bi navê wê "Sakîname" de, di sala 1806 an de kom kirine. Gelek helbesten wî di sedsala 20 an de, li Îran û Iraqê di hin kovaran de hatine weşandin.

## Behzad Berçelanî

Heta sedsala 19 an **Hekkarî** warê hozan û nivîskaren Kurdistan bû. Warekî qedîm û kevnar. Mîrîtiya deverê ya bi serê xwe wekî astengekî bilind û asê bû li ber zimanê erebî, farîsî û tirkî. Hikûmdar xwedî pere bûn û xudbe jî bi navê xwe bi kurdf didane xwendin. Di dîroka bajarvaniyê de tu caran zimanê kurdf ne hatiye qedexe kirin. Kurdf hemû deman, wek giyayê zozanen xwe ter û tol bûye. Bi sedan çiyayen bilind, kîfî, zinar û lat wekî birc û kelata sekinîne li ber singê dagîkeran. Mîrî domahiyê **Nûrullah Beg** di sala 1847 an de li hemberê kedxweren Osmaniyan serhil- dan li dar xist. Hin eşîrên xaîn û xweferîş bûne hevalê dijmin. Hêzên zordar yê hejmara wan zêde, mîrîtiya 487 salî ya serbixwe ji holê rakirin û zimanê kurdf jî cara yekemîn di vê deverê de hate qusandin û av li ser rehîn wî yê kevnare hate birîn.

Zozanen bilind û delal, yê ku bi al-al û asmîn, nêrgiz û beybûnan ve hatine xemilandin, havîngeha wekî eywaneke azadiyê bûn ji bo gelê Hekkariye. Şivan û bêri, xorîn ser bi xêlî, bûkîn dest bi hine, beybûkîn nû gihayî, bê tîrs û bê guman digerîyan li nav mîrg û cîmenan, ser kaniyê cemidî, ber keviyan. Roj û hîv di nav şaxen çiya de her roj bi şikleke dizên. Di bin konê reş de temâsekirina stêrkan dîtina gilawêjê, stêrka "Venus" mijûlahî ya ji bo aşiq û evîndaran e. Geşt û seyran, bêrîvanî, kovana dilan e ji bo zeriyen xizêm sor, koff xwar, tesîrîs, pê



Dîwana Pertew Begê Hekarî di sala 1978 an de bi lêkolîna Sadiq Bahaddîn Amîdî re hatiye çap kirin. Zeynelabidîn Zinar ji tîpîn erebî wergerandîye latîni. Dîwan di sala 1991 an de, di nav Weşanîn Rewşen de derkettye.

xirxal û dest bazin. Yê ku çav kildayî, bisk xelek. Zozan hola aşiq û evîndaran e. Şivanê li benda bêrîvanê, keç û kurên dest girtî gelek caran di bin stêrkan de ramûsanen veşartî û dizîkahî pêşkêş dikine hevûdu.

Ji ber wê çendê ye ku nivîskaré birêz **Doktor Sadiq Bahaddîn Amîdî** di pêşgotina dîwana **Pertew Begê Hekarî** de wih dibêje: "Cî û warêd ew têda mezin bûye, cihê sîrifî, rengîn, bi deşt û çiya gol û havîngeh û zozan bûye. Ew cih warê zanîstî û torê klasîfîya kurdf bûye. Li wir rabûna gelek merîvîd pîspor, zana, gelek mîrât rewşenbîrê Kurd xasma li sedsaliya 14-19 zanayêt wek **Eli Teremoxî, Eli Herîrî, Feqê Teyran, Melaê Batê, Ehmedê Xanî, Mûradxan, Şerefîxan, Şah Pîrto, Siyapoş, Abdulselam Babi** û geleken din ji wî wargehî rabûne."

Belê, her wekî Sadiq Bahaddîn nemir jî diyar kiriye erdnîgarî, xweşî û rîndaya herêmê bûye warê hozan û dengbêjan. Tu gir û banî, dol û newal nînin ku helbest û stiran li ser nehatine gotin.

Pertev Beg yek ji wî karwanî ye. Bi xwe ji mala mîrên Hekkariye ye. Di dawiya sedsala 18 an de û di serê sedsala 19 an de jiya ye. Helbesten xwe di dîwana bi navê wê "Sakîname" de, di sala 1806 an de kom kirine. Gelek helbesten wî di sedsala 20 an de, li Îran û Iraqê di hin kovaran de hatine weşandin.

Dîwana wî di 1978 an de, bi lêkolîna Sadiq Bahaddîn Amîdî re hatiye çapkirin û her wekî diyariyeke nû gihîştiye rewşenbîrê Kurdan.

Her wekî tê zanîn di sedsalîn borî de hozan û nivîskaren Kurdistan ne bi destê xwe, bi mecbûrî di bin tesîra zimanê erebî, farîsî û tirkî de mane. ji ber ku erebî zimanê behestê, farîsî yê qesr, koşk û serayan, tirkî jî yê dagîkeriyê bû. Ji ber vê çendê rewşenbîr û zanayên Kurdistan nikaribûn li derveyî wê tîranê bimînîn. Her wiha gelek gotinê erebî, farîsî û tirkî di helbesten pertew de jî diyar in. Lî belê em dikarin bi serfirazî bêjin helbesten wî cerg, dil û hinavê zimanê kurdf ne. Ji ber vê yekê jî, ji bo me Kûrdîn înkarkîf xelatekî girîng e.

Sadiq Bahaddîn mezinahîya Pîrto ê Hekarî yê navdar bi van peyvan tîne zimên: "Ev hozavane heta niha her nav bûye, bi belavkirina dîwana wî zîrek, pîlevanî û dest hatina wî, dê ji bo rewşenbîrê Kurd û biyanî wekî hîva çardê û roja nîvro rohîn bêt."

Ez li ser vê beynasiya Sadiq Bahaddîn nikarîm tiştekkî zêde ji bo Pîrto bibêjîm. Xwendevanîn **Rojnameya Welat** min bibexşînîn û ew bi xwe li Pertew Begê Hekarî bigerin û binasin...

Helbesteke wî ya bi navê wê "Feqîran dê bi kî ve bikin hewar." dikim diyarî ji bo dilsoz û kovandarê zimanê kurdf. Da bizanîn ku dused sal pêşyê de jî agirê welat-pêzî û niştimanperweriyê li

## AZADÎ

Abdurahman Durre



## Berazê mezin

**D**ibêjin ku şêxekî mezin hebûye, navê wî Şêxê Sen'anî bûye. Şêx, salîx (deng û behsê) keça qralê Ermenistanê hildide û dibe aşiqê wê, ji bo dîtina wê diçe **Ermenistanê**. Dema ku keçikê dibine, bi can û dil pê ve tê girêdan. Dawî terka şêxitî û sofi û mirîdîn xwe dike û li Ermenistanê dimîne. Mirîdîn wî, lê lome dikin û jê diqetin. **Feqîre Teyran** ji, ji wan mirîdîn re wiha gotiye: "Ne eferin ji ehda we re; kafir nebûn bi şêxê xwe re." Yanî, ne eferin ji we û peymana we re, ku hûn jî bi şêxê xwe re nebûn kafir, madem ku şêxê we bû kafir, gere hûn jî, wek wî bûna. **Melayê Cizîrî** ji, di derheqê Şêxê Sen'anî de, di dîwana xwe de wiha dibêje:

**Mey nenoşî Şêxê Sen'anî xelet**

**Ew neğû név Ermenistanê xelet**

**Mislî Mûsa wî tecellaya te dî**

**Ê, te dî, kanê xeta kanê xelet**

Yanî, dibêje ku, Şêxê Sen'anî bi xeletayı, meya evindariyê venexwariye û bi xeletayı ne çûye nav Ermenistanê. Belki, Ew jî weke **Mûsa Pêxember**, ku nûra Xwedê dîtibû, nûra heqîqetê dîtive.

Ê ku heqîqetê bibine, ci bike ne xeta ye, ne çewti ye.

Şêx Sen'anî, li Ermenistanê dimîne û dixwaze ku her roj keçika Ermenî bibine, ji ber wî jî dibe gavanê berazân (wehş û xinzirên) bavê keçikê û her sibe û êvaran keçikê dibine. Dibêjin ku keçik jî, dibe aşiqê wî, dilê wê pîr bi şêx dişewite, ku şêx êvaran berazan dicivîne, pîr zehmetî dikşîne. Keçik ji şêx re dibêje: "Tu li pey berazan yeko yeko dîgerî û pîr zehmetî dikşîni, ku bû êvar, berazê mezin bigire û bi daran lêde, dema ew zûke zûk bike, dê hemû berazân din li zûkîna wî bicivin, tu jî, hemûyan bajo bîne bike tewla wan, bi vi awayê edî tu pîr zehmetiyê nakşîni." Şêx ji mehbûba xwe re pîr spas dike û her êvar berazan wîlo dicivîne û tîne.

Doh, (11 Tîrmeh 1992) di **Rojnameya Özgür Gündem** de, ez rastê beyana Serokî HEPê Feridun Yazar hatim, serokê héja wiha dibêje: "Di Kurdistanê de edî derfeta (îmkana) xebatên demokratîkî nemaye. Ji iro pê de, her dilopek xwîna Kurdistan ku bê rijandin, hikûmet mesûlî wî ye, emê ji hikûmetê hesabê wî bixwazin." Bi rastî ji, ev gotinek pîr cesûr, rast û di cihê xwe de ye, herweki ku di çiroka Şêxê Sen'anî de ji heye, divê ku mîrov hesab ji mezinan pîr bike, ku qarîn û zûkîn bi wan bikeve, dî çel û çejik, nezan û gêjik bi xwe werin rî û hişê wan were serê wan.

Bi baweriya min jî, her insaneyî bê guneh, ku ji teref timan, an ji polisan de tê kuştin, mesûlî xwîna wan hikûmet e, bi taybeti jî, serok-wezir, alîkarê serokwezir, wezirê karê hundir û wezirê parastinê ne, yanî; Demirel, İhnöni, Sezgin û Ayaz in. Eger bi qasî zerrekî xîret û mîrânî di mebûsîn Kurdistan de hebe, dê ji vir pê de, ku insaneyî Kurd bê kuştin, an ji işkence bibine, wê li ser navê wekîliya gel, bi pîsîra hikûmetê û endamên hikûmetê bigrin û bikin bin lingên xwe, ku heta fizara wan biçe felekan. Çend caran ku wîlo bête kirin, dê mesele bi xwe hel bibe. Mîrovên ku ji demokrasî û mafîn mîrovân fîm nekin, heqê wan ev e.

Belki ev baweriya min sert û dij tê, lê belê, ez bi şerefa insanî sond dixwîm, dermanê harbûnê her ev e, teşxîsa nexweşînê ew e ku Feridun Yazar kiriye. Divê mebûsîn Kurd, qenc zanîbin ku, gelê Kurd ew ji bo li "Anadolu Kulubî" şevênen kîf û zewqê bîborînîn neşândîye meclîsê. Ew wekîlî xelkê ne, divê li mafîn xelkê, bi camêrî û mîrânî pîr bikin. Xelkê wan dimîrin, bila ew jî bimîrin, xwîna wan ji xwîna şehîdan çêtir nîne. Madem demokrasî tune, li hîviya ci mane? An bila istîfa bikin, an ji, li dû heqê mezlûman bigerin, hê ku zû ye, ne dereng e. Ji min ji gotinek.

hemberê kedvanen nemir de re ya gul pîrehîn,

Têk mîjîn kirme bax û baxçê deşt û çîmen,

Meyxur û meynûş û mestexaf le ew sêmatan,

Nîne qet ageh jî halê bilbilê dewra wetan

Madî hicran û fîraqê malik xirab.

Xûnxur û xûnrêj û xûne qatîlê ew mehleka,

Meyxur û mexmûr û mesta serxoşa can ez feda,

Şehsewarê şîr û kîra seydê bend merheba

Sed wekî min fil û eslan kirne zindana bela,

Şibî sîrê dil kesek ma seyda humman nebû.

Çûye seyra gulşenê gulçeh-



# Stiran û helbest

Dilketî me, dîlîm ez, deng  
dotmîr û fermandar î  
tu!

Sal û hîv herdem tu  
î, hem rojevîn hem  
rojhilat,

Dîlim ez, dîla wela-  
tî; ez jî qurbana te me, re

Gewre ye hêvîn û  
jîn, lê gewretir al û  
welat!..

(K. Alî Bedirxan)

Hawar e kurê min ranê  
hawar e,

Tu xew meke

Gerek e ku sindûf û  
merbend,

Te zemt meke  
Guliyêñ keçen Kur-  
dan,

Di destê roman de,  
Hawar dike.

Tu xew meke lawê  
min ha were,

Tu xew meke  
(Bozan Şahîn)

Hêstirê min dibarin  
Kulên dilêm hezar in  
Xelk dikevin xewê  
de

Her du çavêm hişyar  
in

Diçê avê esra teng  
Roj li min diçe de-  
reng

Ji wê nayê his û

Ji kerba dikevim ta-  
ye de

Û aliyek çol û beri-  
ye.

(Erd)

Hewarê ev çi agir e  
Carek li min nanere  
Hindik maye ji min  
dirêj,

Taba min herê bi  
(Mihemed Şêxo)

Bêrîvanê mal we-

Şêrînê wey bê xu-  
danê

Zerka te bo çi vala  
ye

Meska te ji bo çi  
qetya ye.

Beriyê bêje beriya  
Esmer û can û zeriya  
Beriyê bêje şivanî  
Guh bide pezê xuda-  
nî.

(Tehsîn Taha)

**TÊDERXİSTINO-**  
**KÊN ME**

1-Garana mama,  
Girtê cema,  
Sibê rabû, yek nema.  
(Stêrk)

2-Tıştekî min heye,  
Eskerê te li ser e,  
Bajarê te jî li ser e,

3-Tıştekî min heye,  
Dirêj-dirêj, heta sibê  
Naghê dûvê kerê.

(Rê)

4-Kîskê sorik,  
Tije morîk.

(Hinar)

5-Qesra şûştî,  
Du feqe tê de rûniştî.

(Gûz)

6-Kumê hûtik, tije  
nûtik

(Hêjîr)

7-Heft tas di tasekî  
de

(Pîvaz)

8-Ji min pekiya, li te  
çikiya.

(Kêç)

**Zargotina Kurdên  
Sûriyê Celîlê Celîl**

**HEJMARA  
KURDAN LÎ  
WELAT ÇIQAS E**

Li Bakurê welat  
13.000.000



Li Rojhilatê welat	Li Hollanda 40.000
9.000.000	Li Fransa 40.000
Li Başûrê welat	Li Erebîstan 36.000
4.500.000	Li Avusturya 23.000
Li Başûrê Rojava	Li Belçîqa 20.000
1.250.000	Li Lîbya 20.000
Li Katar 17.000	Li Katar 17.000
Li Avurstalya	Li Avurstalya 15.000
Li Swîsrê 13.000	Li Swîsrê 13.000
Li Pakîstan 10.000	Li Pakîstan 10.000
Li Uman 10.000	Li Uman 10.000
Li Swêd 10.000	Li Swêd 10.000
Li Danîmarka 8.000	Li Danîmarka 8.000
Li Norveç 5.500	Li Norveç 5.500
Li Îngîlîztan 4.000	Li Îngîlîztan 4.000
Li Urdun 4.000	Li Urdun 4.000
<i>(Arşîva Berxwedan û Rewşen)</i>	

## Dewlet dijminê herkesi ye

### Destpêk rûpel 1

Van rojêne dawî tevlîheviya nav dewleta Tirk zêde dibe. Ji bo vê tevlîheviye biveşere û biniximê ji serokwezirê dewletê Süleyman Demirel û Wezirê Karêne Hundir Ismet Sezgin bigrin ta serokê ordiya Tirk Dogan Gureş ji hemû caran zehftir qala demokrasiyê dikan. Bes ev tevlîheviye pîr cidî ye û xuya ye ku bi gotinê demokrasiyê nema tê veşartin. Ji bo her tişti şinorek heye. "Di demokrasiyan de ji bo her tişti çarek heye" bes tenê bi gotinê "demokrasi" yan ji tu problem çareser nabin.

### MEMURAN Jİ SÉRÎ RAKIRIN

Bi hevkariya nêziki 20 sendikayan, roja 15ê Tîrmehê bi sedhezaran memûr bi awayen cure cure dewlet protesto kirin.

Protestoyen pasif ên memûrana ku di destpêka meha Heziranê de xwe nîşandabûn, di meha Tîrmehê de xwe ges kirin û roja 15 ê Tîrmehê veguhîn protestoyen aktif. Weke ku têzanîn bi cunta ya 12ê İlonê hemû mafêna rexitinî û sendikayî yên memûrana ji wan hatibûn sitandin.

Memûrku xwe tev bida û xwe bîlepitanan an ji karê xwe dibû an ji dihate cezakirin. Hemû komel an ji sendikayîn memûrana hatibûn girtin, revebirêne wan ji hatibûn ceza kirin. Ji ber vê yekê jiyana memûrana bûbû wek ya koleyan. Bi nanoziko dixebeşîn û nikaribûn li tu mafêna xwe xwedî derkevin. Bi zêdebûna pest û neheqiyen re hêdi hêdi memûr bi ser xwe he hatin û dest bi damezran dina komel û sendikayîn xwe kirin. Sala 1992 an, ango ışal hevkâri û piştgiriya memûrana hêza wan xurt kir û pêşî dest bi protestoyen pasif kirin û meha Tîrmehê ji xwe re kirin meha gavavê tina karberdan û cure cure awayen protestokirinê. 15 ê Tîrmehê ji bû çarşema piştgiri û hevkariya sendikayîn memûrana, Ev piştgiri bi milyonan mefnûr nêziki hevûdin kirin û bû roja destpêka serfakirinê.

Ji bo ku hemû mafêna xwe bixin destê xwe; ji bo mafêna demokrafik, aborî û politik 15 ê Tîrmehê bû ga-

vavêtineke piçûk lê pîr girîng.

Protesto û çalakiyên memûrana bi taybeti li bajaren mezîn wek İstanbul, İzmir û Enqere û Amedê pîr dorforschir û bi keyf û şahî çebûn.

Da ku mafêna ku di Rexitina ke- da Navneteweyî (ILO) de hatine tesbîtkirin ji bo memûrana Tirkîye û Kurdistane jî bîn naskirin û di meclisê de bîn qebûl kirin, bi milyonan memûr protestoyen aktif pêk anîn. Li çar aliyan Tirkîye û Kurdistane hin memûrana dev ji kar berdan û meşyan, hin ji wan karê xwe hêdi û giran kirin, hinek ji wan ji derketin kovîzeyê, bordroyen xwe sewitandin, xwarin nexwarin an ji bi awayekî din besdarî protestokirinê bûn.

Memûrîn Belediya İstanbul dê 15 ê Tîrmehê qet nexebeitin bordroyen xwe şewitandin û daxuyaniyekî dan çapemniyê.

Wekî din li İstanbul, memûrîn sendikayîn Tüm-sağlık-sen, Tüm-bel-sen, Tüm Ray-Sen, Eğit-Sen, meşyan û mîtingen dorfireh li dar xistin.

Li Enqere memûrîn Tüm Bel-sen, Tüm sağlık Sen, Yapı Yol-sen, Maden-sen û Tüm Maliye Sen kar berdan û dewletê protesto kirin.

Li İzmir, Amedê, Tunceli Adi-yaman, Mardin, Burdur Edenê û Meletê ji protestoyen memûrana bi awayen gurr û geş çebûn, li van bajaran mîting û meş bi besdariya gîrsen gel û alikariya karker û wela-parêzan hatin pêk anîn. Revêbir û niwêneren sendikayîn memûrana di daxuyaniyê xwe de bîr yardarı û bîr û baweriya xwe ya hevkariye anîn ziman û gotin ku dê van protestoyen xwe berdewam bikin û roj bi roj bi hêz û xurttir bikin.

Ev karberdan, meş, mitîngen memûrana hevkari piştgiriya memûrana hin xurttir kirin û memûrîn ku ta iro newêribûn li mafêna xwe bipirsin dîtin ku bi hevkariye û yekîtiyê dê dikarîn li mafêna xwe bipirsin û xwe hêdi hêdi ji nîrîn koletiyê xelas bikin.

Ev ji pêvajoyeke nû ye li Tirkîye ji bo memûrana.

Li Tirkîye sertewandi mabûn memûr, ew ji edî serihildan.

## Dewletê wezîfa..

### Destpêk rûpel 1

Kovara İslâmî a İbda-C, "Ak-zuhur" di hejmara nû (5) de li ser livbaziyên Hizb-i kontra disekine. Em vê nivisarê ji bo xwendevanê xwe bi kurdî di weşinin.

"Dikare bê idîa kirin ku aligirê Iranê hem li dijî PKK, hem ji li dijî komara Tirkîye ne.

"Lê di karvaniyê (pratikê) de ev gotinê tê idîa kirin û rastî, diyar e ku hevûdu nagrin. Bi awayekî vekirîr ku mirov bêje, aligirê Iranê helwesta ku li hember PKK û didomînin, eynî helwestê li dijî komara Tirk û hêzên wê yên îşkencekar nîşan nadin.

Aligirê Iranî, rôxistina Hizbulah berevajiyê vê tujbûna xwe, li hember dewletê pîr nerm û xwe dispîre merhamet û serwextiye dewletê. Ev ji vê rôxistinê hêdi hêdi dixe dirîve "ülkütçîyên" berê yên ku bi piştgiri û alîkariya dewletê li dijî "bela komunizmê" serdikirin û di dewiyê de bûn sebebê mirine bi hezaran xortan. Rexitina Hizbulah ji bi vê meşîjî ülkütçîyân dimeze.

"Em nebêjin alegirê Iranê cîma li dijî PKK û ne, em dibêjin helwesta wê ya li dijî PKK û sebebênu ku ji bo vê helwestê nîşan dide hevûdu nagrin. Ülkütçîyân berê ji eyn wek Hizbulah dest bi şer kîribûn û beredayî bele sebep hem-welatiyê muxalif bi hev dabûn kuştin.

Di dawiyê de ji sazûmana Kemlist ji kirinê wan feyde sitandin.

"Iro, dijminê ku mirovîn Kurd diperçiqnê ne PKK ye, û ku bi awayen curbecur zilmê bi gelê Kurd dike, işkence cînayetan dike dewlet bi xwe ye.

"Aligirê Iranê di sîuna ku siyaseta xwe ya şoreşê pêk bînîn û bi pêş ve bibin û xwe bi gelê Kurd bîdin qebûl kirin, radibin xwe nêziki dewletê dîkin hedefeke esasî. Ev

## Ev şerekî ilankirî ye

### Destpêk rûpel 1

dom dike. Di derheqê kuştî û bîrindaran de nûce nay stendin.

-Li ser riya Pasûr (Qulp) û Licê erebeyek ku ji leşkeran re nan dibir ji teref gerîyan ve hat sekinandin, şofêrê erebê Sedat Öz Türk û xwe-diye fîrinê Mehmet Erbakan hatin kuştin.

11.7.1992 -Li navçeya Dersim Pulumur gerîyan êrîşek mezin bir ser qereqola gundê Areke. Di êrîşê de qereqol hate hilweşandin û 18 leşker hatin kuştin, 2 panzer ji hatin şewitandin. Pişti vî êrîşî, leşkeren Türk bi hejmarek zêde leşker û tîman ve û bi alîgiriya helîkopter û balafiran dest bi operasyonan kirin. Di van operasyonan de helîkopterek ji tevî leşkeran hate xistin. Şer bi şev û roj dom kir. Tu zaialeten gerîla nînin.

12.7.1992 -Li Motîk 3 leşker, serbaz (astsubay) û cerdevanek ji teref gerîla ve hatin kuştin.

-Li Hekarî gerîla bi ser çadîren komandoyan ve girt, 2 leşker hatin kuştin 6 ji birîndar bûn. Ev komando hazırlaya operasyonan Kurdistana Başûr dikirin.

-Li gundê Nisêbinê Cibiltene 3 murxub bi direkîn ceryanê ve hatin daleqandin. Li ser cesedîn wan daxuyaniyek ARGK hebû. Di daxuyaniyê de ji bo van kesen kuştî xâin û murxub dihate gotin.

14.7.1992 -Li Mêrdîne 6 gerîla di sitargehîn xwe de bi bombezîn leşkeren Türk hatin kuştin. Di vî êrîşî de 9 cerdevan û zarokeki hatin kuştin. 4 gerîla ji mirin.

-Li Pîran (Diyarbakır-Dicle) di nav hêzên dewletê û gerîla de şer derket, 4 leşker hatin kuştin, 3 heb ji birîndar bûn.

-Ji eşîra Pînyanî (Hakkari Çukurca) 32 cerdevan çek danîn û dev ji cerdevanî berdan.

-Li navçeya Şîrmex Beytuşşebab

gerîla êrîşî bi ser gundê cerdevanan. Di vî êrîşî de 9 cerdevan û zarokeki hatin kuştin. 4 gerîla ji mirin.

-Li navçeya Şîrmex Uludere

tîmîn taybetî li mal û erebeyen xelkê gulle reşandin. Li Uludere tu mal û erebeyek ku gulle nexwaribe nema.

## Nameyeke vekirî..

### Destpêk rûpel 1

Derziyek li "Şîli" biketa, deng diçû N. Hikmet.

Lê hewara zarok û jînê Kurdistanê -di gel ku bilind û bi şewat bû- nedigî hiştîhu Nazîm!

Gurmîna tanq û top û balafirê ku gundê Kurdistanê hildiweşandin nedigîhiştî.

Nazîm Hikmet geleki navdar e li ba me, min helbesten wî xwendine, wî li ser her kesî nîvîsandiye...

Li ser Berxwedana Stalingradê, Berlîna rizgarkîri Parisa Paul Eluard heta li ser boyâ ciyê. İstanbulê nîvîsandiye...

Tenê Kurdistanâ ku di bin çengê wî de ye... nehate bîra wî!

Gelo Diyarbekir dûr e yan Santyago?!

Li Istenbolê û Enqera her roj cejn û seyran e

Kef û şahî ye tiqtîqa kenê keç û xorta ye

Li Kurdistanê hîsîr û xwîn û gullebaran e, gurmîna firoka ye, lê mixabin deng nayê we, na ez şâsim hûn deng nabin xwe.

Ismail Beşikçi tenê camêr derketiye û bê tîrs li ser doza me sekiniye, lê meteloka me ya kurdî dibêje: "Gulek tenê bihârê çê nahe."

We çavén xwe girtiye û paçikê nîjadperestiyê xistî guhêne xwe, we devê xwe bi ta û derzya şovenîzmê dirûtiye, ka çawa hûnê bibînin û bibîhîzin û dûre rastiyê bêjin?

Mîlyonek kesen kor ji yekî bi çav re bêjin: Roj tune bê guman ewê bi çav baweriye bi wanayne, ez hêvîdar im hûn ne di réza koran de bin û rojê înkâr nekin.

Ne xayîn bin bi xameyên xwe re, bi mîrxa li hember zilme rabin.

Hemkârên min:

Xwîn dirije gola xwînê roj bi roj firehîr dibe.

Divê hûn ji alî xwe de û em ji alî xwe de kar bikin

Ji bo em tev di vê gola xwînê de nesîtin

Bi dengê bilind bêjin: Zarok û ciwanen me neşin

Kurdistanê neşin wê doje hê-Vietnam-ji me ne

kêm in. Ciwanen me vala têne kuştin Nîvîskarê Tirk:

Bila gunehê we bi dayikên we bê za-

rok edî sêwî nebin, li sîuna gîrî û şînê, bere cejn û şahî be li welatême.

Ji bo dilê dayikên Tirk edî neşewite, ji bo dayikên Kurd dergûşen xwe vala nehejînin.

Ji bo hûn rola xwe ya rast bilizîn û cihekî di dîroka xwe û me de bigrin, xameyên xwe ji ber guhê xwe derxin û bê tîrs rastiyê bêjin.

Spas...

Sefera Navenda..

### Destpêk rûpel 1

Çalakiyên Navenda Çanda Mezopotamya yê, bi şahiya piştgiriya navendî li rexê Behra Sipî, gavek dinê hev avetiye. NÇM û berî vê çalakiyê ji, li bajare İstenbolê şahiye çekiribû. Di van çalakiyan de armancen navendê anîne zimên.

Navendê di navbera 4.7.1992 û 11.7.1992 an de li çar bajarê İskenderun, Adana, Mersin û Antalya.

Behra Sipî şahî çekirin. Di van şahiyan de, komên di bin siya Navendê de, hunerên xwe yên şoreşgerî pêşkeşî temaşevanan kirin.

Di axavtina vekirina şevan de li ser nav NÇM û bîrêvebir NÇM û Filiz Oğuz wiha digot: "Bi sedsalan e ku çanda gelê Kurd, ji hêla dagîkeran ve tê talan kirin û dizîn. Ger em weke ku iro li têkoşîna xwe ya çekdarî xwedî derdikevin. Li çanda xwe ji xwedî dernekevin, wê demek bê emê tune bibin. Tişten ku gelan li ser xwe digre çanda wî ye" piştî axaftinê, folklorâ Amedê bi destmalen kesk û sor û zeri ji hêla folklorist NÇM û hate leyistin.

Ji bili folklorê, komên muzikê ji hebûn. Ev kom, Koma Mezrabotan. Koma Botan, Koma Ciya û Koma Azad bûn. Şevê NÇM û bi besdarîya dehezaran û sloganen azadî û serxwebûn qediyen.

# Welatê komegoran: Kurdistan

● Li Kurdistanê bêhejmar gorên lod bi lod hene. Yek ji vana jî Newala Sefo ya ku li gundê Qoçqirana jorîn a navça Özalp a Wanê a ku bi Kurdistanâ û Iranê ve ye. Ev mirovên ku ji bili kurdbûna wan tu sucekî wan tunebû, dest û piyêwan girêdayî bê çek û bê parastin bûn ji alî "Ordiya Tirk a Mêrxas" ve hatin gullebarankirin.

● Îsal salvegera 49. a qetîama 33 gulle ye û tam 49 sal e ku eqrabayêvan mirovan nikarin bikevin Newala Sefo. Ev newala ku hawirdora wê bi notirvanen bi çek û têlan hatiye rapêçandin, destûr tune ye ku hestiyen van 33 gundiyan Kurdênu ku ji gur û çivikan re bûne êm, bêne civandin. Dewlet ji hemû seredanan re bi tade û bi zorê dibe asteng. Baş e ev dê heyâ kengê bidomîne?

## Günay Aslan

Kurdistan welatekî komegoran e. Li ser erdnîgariya welat her ciyênu ku gav lê têna avetiñ, iñtimala rastlîhatina şopa qetîamekî heye. Di demajoya dîrokê de ew dewle-mendî û nîren ku xwediyyê wê bûye, ji bo wê bûye bêyomî û Kurdistan ji dagîrkerî talan û wêrankirinê riz-

gar nebûye. Ev aqûbeta Kurdistanê ya ku îro jî bi vî awayî didomîne ji bo mirovatiyê şermekî mezin e.

Sedemeke din a van qetîaman û di her demajoyeke dîrokî de zêdebûna van jenosidän jî, li ser axa welatê xwe xwedî biryar nebûna Kurdan e. Gorênu lod bi lod encameke xwezayî (tabii) ya statuya mêtîngîhbûnê ye.



28'ê Tîrmeha 1943 an dema berbangê, bi fermana Qomutanê Ordiya Sêyemîn Mustafa Muğlalı 33 kes gundiyan xizan ên Kurd bê derz hatin infazkirin.

Erê, li Kurdistanê e ku eqrabayêvan mirovan bêhejmar gorênu lod bi lod hene. Yek ji vana jî Newala Sefo ya ku li gundê Qoçqirana jorîn a navça Özalp a Wanê a ku bi Kurdistanâ û Iranê ve ye. 28'ê Tîrmeha 1943 an dema berbangê, bi fermana Qomutanê Ordiya Sêyemîn Mustafa Muğlalı 33 kes gundiyan xizan ên Kurd bê darz hatin infazkirin. Ev mirovên ku ji bili kurdbûna wan tu sucekî wan tunebû, dest û piyêwan girêdayî bê çek û bê parastin bûn ji alî "Ordiya Tirk a Mêrxas" ve hatin gullebarankirin. Bi vî awayî hêzên Tirk ên nijadperest ji dîrokê re rûpelekî "bi nav û deng" diyarî kirin. Pêwist nîne ku bê gotin ev rûpelekî dîrokê yê herî bêbext, herî xayin û herî xedar e.

Yênu ku gulle berî azadî, kesanî û nasnama Kurd di-din weki cinawirêni çirokan, her ku nijada wan ber bi qedandinê ve diçe bêtir êrişkar dîbin. Îro jî li ser hev, an yek bi yek sedemê kuştina mirovên me ev e. Dîrok ji jiyanâ gelên bindesten rizgarbûyi nişan dide ku ev hovîti çare nînin. Hovîtiya mêtîngîkarî weki bîranîneke xerab bi lez dûr dikeve.

Îsal salvegera 49. a qetîama 33 gulle ye û tam 49 sal

nikarin bikevin Newala Sefo. Ev newala ku hawirdora wê bi notirvanen bi çek û têlan hatiye rapêçandin, destûr tune ye ku hestiyen van 33 gundiyan Kurdênu ku ji gur û çivikan re bûne êm, bêne civandin. Dewlet ji hemû seredanan re bi tade û bi zorê dibe asteng. Baş e ev dê heyâ kengê bidomîne?

Gotinek pêşîyan a Kurdan heye; "Neyarê mîrxas; dikuje, lê dike gorê jî. Ev bêxawêni ye, hem bikuje û hem jî hestiyen wan nedî malbatênu wan. Salixê dijmînatîyeke wiha ne tê kirin û ne jî tê dîtin.

Li Tirkîye êdî dewrek li ber girtinê ye. Demajoya tarî ya ku li ser îmha û înkârî ava bûye, di serî de bi muxalefeta ku bi PKK'ê re derket û bandûra dinamîkên din û bûyerên ku li dinê pêk tê, êdî di nav rûpelên dîrokê de li ber windabûnê ye. Bi temambûna vê merhelê, dê gelê Kurd tedbîra van nehe-qiyen ku ji dîrokê têni bistîne. Di gel Agirî-Zilan, Dêrsim-Munzur, Palo, Gurzûva, Newala Sefo, Newala Qoter û Newala Qesaban ji bo neletkirina hê gelek qetîamên li ser hev, divê "Rojekî Şînê ya Neteweyî" bê îlankirin û

Newala Sefo ya ku 33 gundiyan Kurd ên xizan lê ne, Gorek Bîrdarî bê çêkirin. Dê 1993 bibe 50 salibûyina qetîama 33 gulle. Kesê ku dibêje ez mirov im û idîa dike ku nirxen wî yê mirovatiyê rizî nebûne û her dor, divê qampanyayekî çalak dest bidin pê kirin û roja 28'ê Tîrmeha 1933 an li Newala Sefo bêne ba hev.

Xawêna mirovatiyê dê vê bisipêre. Ez di wê baweriye de me ku di serî de Rojnameya Welat, tevêne sazgehêni çapkirin û weşandînê, xebatkar û sazgehêni demokratik dê piştgiriya xwe nişan bidin. Gava ku qala 33 gulle tê kirin ew hozzanê mezin ê tê bîra mirov Ahmed Arif e. Ez gotinê ji wî re dihêlim.

**Ez hatime kuştin  
Xewna min  
ji şevan tarîtit  
Kes napirse li rewşa min  
Canê min distînîn bê  
ecel**

**Di tu pirtûkan de tune .  
Şifre fermiye paşekî  
Hatime kuştin  
Qet bê pirs û bê darz**

(A. Arif, Qeydan Kevn Kir Min ji Hesreta Te, Werger: Felat Dilges)

Ji 33'yan Sultan Özay

welat

- Li ser navê IMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır
- Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yazıcı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 511 57 60 - 511 66 02
- Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ